

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

ZIVISTAN/2008



36

EM HÊVÎ DIKIN SALA 2008AN JI BO GELÊ ME  
Û HEMÛ GELÊN DUNYAYÊ, BIBE SALEKA ARAM

# bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 36, zivistan 2008

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikaili, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen  
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Address

Navnîşana li Swêdê  
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige  
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebn.com

Internet

www.birnebn.com

Navnîşana li Almanyayê

Muzaffer Özgür/Birnebn  
Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya  
Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro  
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyi Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için  
APEC, "Birnebn" PlusGiro-Stockholm/Sweden  
BIC: NDEASESS  
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Belavkirin / Dağıtım

Danimarka: İrfan Baysal, 0045-27 11 58 83  
Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32  
KIZILAY / ANKARA  
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center  
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A  
Polatlı-Ankara  
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi  
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB



Dîmenek ji şênahiya sersala li Basalê -GÖLSAG

*Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.*

*Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebnê re  
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li  
xwedîyan nayên vegeandin.*

*Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û  
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.*



Wêneya li berga pêşi: „Bendava Îlisu û Heskêf“  
Wêneya li berga paşi: "Aştî"  
Wênekêş: H. Hüseyin Deveci



- 2 Bi hêvîya ku kurd ê careka din neyên xapandin!... **Ali Çiftçi**
- 4 Nûçe-civak: Golsagê li Baselê şênahîya sersalê pîroz kir **Muzaffer Özgür**
- 7 Li Kölnê pêşangeha wênekêş H. Hüseyin Deveci **Muzaffer Özgür**
- 8 Pêşmerge, zimannas, dîplomat û konsolos Ahmed Bamernî **Amed Tigrîs**
- 14 Konferenasa zimanê kurdî ya netewî **Nuh Ateş**
- 17 Bazirganên dîne Îslama hêja! **Hilmî Yeşiltaş**
- 18 Klîbên hunermendên kurdên Anatoliya Navîn **Muzaffer Özgür**
- 28 Jinên kurd di serdema osmaniyan de **İkram Oguz**
- 29 Nisti **Mem Xelîkan**
- 31 Heyfên Beqan - 1 **Uskî Cîmîk**
- 35 Şeva Altîlera **Ahmed Gezer**
- 39 Helbest: Çi bû! **Mem Xelîkan**
- 40 Wê şewê **Seyfî Dogan**
- 41 Ez di xwe de girtî me **Xizan Şîlan**
- 43 Meteloka Ewra dûrandinê **Rebenî Celika**
- 44 Meteloka Perê bûk û xwesîya wê **Rebenî Celika**
- 46 Tirba gewr **Rebenî Celika**
- 50 Helbestek û wêneyek **Rohat Alakom**
- 53 "Başarılan Barış" **Michael Feiler**
- 65 Özlem Çekiç **İrfan Baysal**
- 67 Anadolu nereye kadar uzanıyor **Memo Şahin**
- 71 Rengdêr **Amed Tigrîs**



## Bi hêvîya ku kurd ê careka din neyên xapandin!...

Me sala 2007an bi buyerên rind û nerind li pey xwe hişt û bi hêvî û daxwezên nû em ketin sala 2008an. Bi hêvîyên dilpak, em sala nû ji bo xelkê xwe û hemû xelkên din yên li ser rûyê dunyayê, jîyaneka aram û azad hêvî dikin.

Lê, mixabin rastîya jîyanê jî her bi daxwez û hêvîyên dilpak nameşe. Bûyerên ku heta niha li ser axa welatê me rûdane vê rastîyê pir vekirî dide ber rûyên me.

Werin em bi hev re, pir bi kurtî, li dîroka Tîrkiyê ya 84 salan binêrin ka ji bo gelê kurd çi kiriye; em dibînin ku ev gelê me herdem hatiye xapandin. Kîngê daxwezên xwe yên netewî bilind bûne ev dewleta tirk a kewneşopiya osmaniyan a mîlîtarîst û nijatperest, bersiva gelê me bi înkârî û terorê daye. Ji ber ev Dewleta Komara Tîrkiyê ji aliyê serokatîya kesên mîlîtarîst û birokrasiya sîvîl a berdewamîya împeratorîya osmaniyan ve hatiye avakirin, qanûna xwe ya bingehîn jî li ser esasên otorîter û yeknîjadî hatiye danîn. Binêrin, kîngê daxwezên mafên demokratîk û yên kurdan hatine rojevê, ev dewleta mîlîtarîst xwe avetîye paş qanûnên xwe yên bingehînên kemalîst. Bi rêya mîlîtarîzmê ew daxwezên mafên kurdan şikandine. Ji 1923an vir de çend caran qanûna xwe ya bingehîn guhartine. Her dema ku guhartine, ber bi mîlîtarîzmê ve birine û mafên demokratîk kêmtir kirine. Heta 1950î ji xwe bi sîstema yekpartîyê bi rê ve birine. Ji bo guwişandina mafên kurdan, 1924an de

destpêkirine qanûna xwe ya bingehîn her tim biguharînin. Di 1961an de jî em dibînin ku qanûna "Millî Güvenlik Kurulu" MGK, damezrandine. Piştî herku darbeyeka eskerî bûye, wek 1971, 1980î ku bi wê re xwestine di qanûna xwe ya bingehîn de guhartina bikin û her dîtina xwe ya otorîter û nijadperest derxistine pêş û heta niha jî dimeşînin. Ew munaqaşeyên ku niha jî li ser guhartina qanûna dikin û dixwazin, tenê ji bo endametiya YE yê ye. Ew guhartin jî dê dîsa li gor dîtina mîlîtarîzmê bibe. Ji ber vê jî divê em tu hêvîyên xwe bi guhartinên qanûnên ku bi rêya partiyên sîstemê ve dibin, girê nedin.

Ev hukumeta AKPê ku bi dengên kurdan hat ser hukum, disa wek di destpêka avakirina Komara Tîrkiyê ku Mustafa Kemal çûbû ba serokeşîrên kurdan û ew bi gotinên wek "..."*Ev komara Tîrkiyê ji kurd û tirkan pêk tê, her mafê netewî yê kurdan jî dê wek yên tirkan bêt parastin. ...*" û bi van gotinan kurd hatin xapandin. AKPê jî di hîlbijartinan de bi gotinên wek, "... li Tîrkiyê mesela kurd heye ev mesela kurdan jî mesela me ye, em ê mafên kurdan hal bikin..." heta di hîlbijartinan de, li Kurdistanê bi zimanê kurdî propaganda xwe jî dikirin. A nika zimanê kurdî jî qedexa dikin û di şopa kemalîzmê de şerê kurdan dikin!.. Lê kurd hêdî ne kurdên berê ne, em hêvî dikin ku kurd ê careka din neyên xapandin!..

**Ali Çiftçi**



Merhaba,  
iyi günler!

Ben iki üç yıldır derginizi yarım yamalak takip eden cihanbeyli/kelhasanlı bir hemşehriniyim. Öncelikle şunu belirtmek isterim ki birazdan yazacaklarımda herhangi bir ön yargıyla hareket ettiğimi düşünmemenizi isterim.

Ayrıca yazacaklarım derginize ve sizlere yönelik bir eleştiri değil sadece bizleri ilgilendiren konularımızda belki de hepimizin yapması gereken bir görüş bildirmedir.

Asıl meseleye dönecek olursam:

Dün uzun bir aradan sonra yine derginizi yazıları arasında dolaşma fırsatı buldum ve bu gezintiden sonra sizlere görüşlerimi bildiren bir yazı kaleme alma fikri kuvvetlendi.

- Gördüğüm kadarıyla derginiz özellikle İç Anadolu Kürtlerine hitap etmektedir; ama ben derginizin bizim yöre insanımıza hitap etmede artık çok uzaklaştığı kanısındayım.

-Çünkü sizin temsil etmeye çalıştığınız ya da onlar için çabaladığınız bizler özellikle son zamanlar da bizim dilimizden daha de uzaklaşan dilinizde fuzuli bir akademikleşme ya da fazlasıyla bir süslülük görüyorum. Aslında halkın kullandığı dile bir takım iyileştirmelerle -aslında kullanılanların yerine başkaları getirilmeden- daha fazla hitap kitlesine kavuşacağını görüyorum.

- Oysa ki görüyorum ki sizin dilinizin dergide yöreden yapılan alıntılar hariç- faz-

lasıyla akademik olan kürtçe ulusal gazete ve dergilerden pek de farkınız kalmamış. Bu yöreden beslenen ve yine bu yöreye yönelen bir derginin dili de bana göre yöreye uymalıdır. Bunu söylerken tamamiyle bir yöresel ağız özelliğini de kastetmiyorum.

- Bir de derginizde gerek araştırmalar sayesinde gerekse kültürel konulardan ve yazarlardan çıkardığım sizlerin siyasi ve dünya görüşlerinizin de bugün yöremizde yaşayan halktan çok fazla uzak olduğunu söyleyebilirim.

- Sizin siyasi bir dergi olmadığınız su götürmez bir gerçek: ancak sizlerin bihaber ve bigörüş olduğunuzu da söyleyemeyiz. İşte asıl sıkıntı dolaylı yoldan okuyucular tarafından sezilen fikir ve görüşlerin bizlere değil yine bana göre sadece Avrupa'daki çok sınırlı ve biraz daha duygularını ve Türkiye'deki geçmiş yıllarındaki nahoş olayları işin içine katarak hareket eden birbirinden uzak; ama fikirsel anlamda birleşik bir gruba hitap ettiği gerçeğidir.

-Yine bana göre derginiz çoğu halkbilimci Türk bilim adamlarının yaptığı bir hatayı tekrarlamaktadır. Siz de bilirsiniz ki çoğu bilim adamı Türkiye'deki halk bilimi ve halk edebiyatı kürsülerinde bilim yapma adıyla halkın mazıda bıraktığı dört-beş yüzyıllık folklorik malzemeye kazıya kazıya, harmanlaya harmanlaya -bir de herhalde ödenek adı altında devletten yardım da alıyorlardır- habire geçmişin küllerini ısıtmaya...

**Umîde Bekirî Henifê**

## GÖLSAĞÊ LÎ BASELÊ ŞENAHÎYA SERSALÊ BÎ COŞEKA MEZÎN DERBAS KÎR

Amedekar: Muzaffer Özgür



Wek te zanîn Komela Gundê Xelikan-Saxlikê-GÖLSAĞ li Avrupayê xizmetên insanên xwe dike. Îsal jî ji bo sersalê bi hevûdu ra derbas bikin şenahîyek li Baselê amade kiribû. Ez jî hatim dawetkirin û li şenahîyê bûm. Gundîyên Xelika û Saxlikê ne bi tenê bûn. Ji gundên Kulu û Cihanbeylîyê jî beşdar hebûn. Ew mîna ku li şenahîya gundên xwe bûn. Şa û bextewar bûn. Bi rastî Komitê (Bilal Akarsel, Ömer Koyuncu, Şemo Çakmakçı, Mehmet Biçer, Mehmet Sığircı û Tahsin Yavuz) şenahî hazir kiribû, bi fedakarîyeka

mezin karê xwe dikirin. Kêmasî hebûn lê hevdîtina însanên me ev kêmasîyana ji holê rakiribûn.

Di bernameya şenahîyê da xortên Xelika cîh girtibûn. **Mazlum Çakmakçı di** destpekê da stranên xwe gotin. **Xelikanli Ahmet** bi hez û dil stranên xwe gotin keç û xort li govendê şad kirin. Dema ji gund video hat pêşkêşkirin însana ji hevdu pirs dikirin, ew kê ye? Mala kê ye? Dîmenên berê însan xemgîn kirin. Wexta sersal nêzik bû, stranbêjê aliyê me **Cejno**



derkete ser sükê. Piştgiriya Cejno bi kêf hat pirozkirin. Cejno, dema saeta sala nû merandin, bi ruhekî netewî merşa kurda ya netewî *EY REQÎP* got û insanên me li pê sekinîn û hemûyan bi hev ra gotin: *kurd namirin!..* Komîtê bi tombalê zarok şa kirin. Şênahî heta saet duduyê şevê berdewam kir. Min pirr însanan ra sohbet kir, hevalên xwe dîtin. Hissên çend kesên din jî weng bûn.



### Hamit Özden:

Ez ji gundê Cihanbeyli-Kelhasan im. Xelikan jî gundekî qezê. Ez li Baselê dijîm. Pirr hevalên min ji gundê Xelikan hene. Şênahîya ji bo sersalê hatiye hazirkirin, karekî pirr baş e. Însanên me tên cem hev û hevûdû dibînin. Tekilîyên me bi hevûdû ra çêdibin. Zarokên me hevûdû nas dikin. Eger em li mal bimana malbata min tenê bû. Niha em li cem pirr însanên xwe ne.





Bi klam û govendên aliyê me em dikevin sala nû. Ma sala nû ji hemû insanên dinê, bi taybeti jî ji gelê me ra pîroz be.



**Kek Şîrîn:** Ez ji gundê Xelikan im. 22 sal in li vir, li Baselê dijîm. Ez jî di nav karûbarê Gölsağê da me. Karekî pîrr pîroz e. Ez ji bo amadekirina şênahîya sersalê pîrr şa me. Şênahî û şevên weng gere in. Eger tu bibe jî çima, ez dibêjim insanên me tene ba hev. Dema dawiyê pîrr êriş tene ser gelê Kurd. Ji ber ku hemberî êrişê jî wek hember derketin karekî mezin e. Em dixwazin jiyandina kultur û folklorê xwe bidomînin. Bi hevûdu naskirinê em tekilîyên xwe xurt dikin. Ciwanên me hevûdu nas dikin. Dema ez wan stranên tene gotin dibizim dilê min dêşe û zîz dibe. İnsanên me yê dert û kul kişandinî pîrr in. Bi strana wan êş û dert tene ziman. Dema min li videoya

hazirkirî, mes kir ez çûm gund, dilê min êşîya. Ez ji aliyekî da şa me, ji aliyekî da jî xemgîn im. Ma sersala nû li hemû cîhanê pîroz be. Ji bo gelê me jî aşitî û yekitiyê bîne.



**Fatma Torca:** Ezê ji Xelika me. 65 salî me. Kurikên min î gîyê li wir in. Min xwest ez gundiyan xwe bibînim. Gîyê li xeribiyê man e. Pîrr bûne. Ez li wan mes dikim û bi sime wan ra ew ji mal û malbata kê ne, nas dikim. Bi kilamên me ez pîrr şa dibim. Xort û qîz tevûhev govendê dikşînin. Mîna berê fedî nakin weng hîn rind e.



Dîmenek ji şênahiyê



# Li Kölnê pêşangeha wênekêş Hasan Hüseyin Deveci

Wênekêşê kurd, Hasan Hüseyin Deveci, pêşangeha xwe ya şeşan di bin navê *bi hev ra* li Almanyaya-Bajarê Kölnê bi kokteylekê vekir. Hunermendê me, ez jî daweta kokteylê kiribûm. 50 kes, kurd û alman di kokteylê da amade bûbûn. Di xeberdayîna vekirinê da H. Hüseyin got: „*Însanên zimanê hevûdu dizanin ne, yê hîssên xwe bi hev ra parva dikin, dikanin hevûdû fêhm bikin. Berhemên min rengên hîssê min in.*“

H. Hüseyin jîyana kurd û Kurdistanê anîye ser tabloyên xwe. Mînak: *Şer, Aşîti, Hûner, Evîn, Gundên şewitî, Goçberî, Çîya û Govend* û yd. Ji bo Aşîtiya dinê û Tîrkîyê jî berhemên xwe hebûn. Dema min jê pirsî wî got: „*Stîlê min expresîyonîst e. Yanî; di jîyana hatî jîyandin da tiştên çêbûnî ez bi ditinên xwe û hîssên xwe tevûhev dikim û wêneyê xwe çêdikim.*“

„Güçlülkle“



H. Hüseyin li ber wêneyê bi navê „*Mozaik*“

## H. Hüseyin Deveci

H. Hüseyin ji gundê Beşkardeşê ye. Sala 1972an ji dayik bûye. Dibistana lîseya-Kulu xelas kir şûnda derketiye dervayî welat û 13 sal in li Almanyayê diji. Zewicî ye û bavê zarokêkî ye.



Pêşmerge, zimannas, dîplomat û konsolos

## Ahmed Bamernî



Konsolosê Îraqê birêz Ahmed Bamernî

Foto: Amed Tigrîs

*Alî Çiftçi û Amed Tigrîs li ser navê kovara Birnebûnê di roja 2008-01-09an de, li Stockholmê bi konsolosê Îraqê birêz Ahmed Bamernî re hevpeyvînek çêkirin. Em vê hevpeyvînê li jêr pêşkêşî we xwendevanên xwe dikin.*

*Red.*

*Alî Çiftçi: Cihê şanazîyê ye ku em kurdekî wek sefirê Îraqê li Swêdê bi kurdan bidin nas kirin. Birêz Bamernî hûn dikarin xwe bi xwendevanên kovara Birnebûnê bidin nasandin?*

**Ahmed Bamernî:** Ez di sala 1952ê de li Bamernê hatime dinê. Min dibistana sereta li

Bamernê xwend. Piştê xwendina navendî û lîsê min li Amedîyê xelas kir. Ez di sala 1969ê çûm zankoya Bexdayê. Min li wir ziman û edebîyata îngilîzî xwend. Di sala 1973an de min xelas kir. Di sala 1974an de ez bûm pêşmerge heta ku şoreş xelas bû. Di sala 1975an de bi qasî sê meh û nîvan

**“ Ez li gel birêz  
Mam Celal vegeerim  
Kurdistanê. Ez li wir  
heta sala 1994an  
mam. Ez di listeya  
Yekitiya Nistimanê  
Kurdistanê de bûm  
endamê parlamentoya  
Kurdistanê. ”**

ez li Îranê mam. Paşê ez hatim Ewropayê. Di sala 1976an ez çûm Fransayê û ez li wê derê mam. Min doza îlticayê kir û îltica min qebûl bû. Li wir bûm nûnerê Yekitiya Nistiman.

Di sala 1980î de vegeerim welat. Piştê dîsa vegeerim Fransê û min li Sorbonê lîngustîk xwend û doktora kir. Li wir nûnerê Yekitiya Nistiman bûm heta sala 1991ê. Ez li gel birêz Mam Celal vegeerim Kurdistanê. Ez li wir heta sala 1994an mam. Ez di listeya Yekitiya Nistimanê Kurdistanê de bûm endamê parlamentoya Kurdistanê. Piştê demêke din dîsa çûm Fransê. Birêz Mam Celal ji min daxwaz kir ku ez biçime Duhokê. Ez di sala 1997an de çûm Duhokê. Ez li gel ewropîyan çûm. Careke din ez vegeerim Parîsê heta sala 2003an. Ez di oktobra 2004an de hatim li Swêdê bûm konsolosê Îraqê.

*Alî Çiftçi: We got ku min lîngustîkî xwendîye, gelo we li ser wê jî qet kar kiriye an ne?  
Di warê ziman de xebatên we hene?*

**Ahmed Bamernî:** Min lîngustîk xwendîye û teza xwe bi fransî nivîsiye. Na, ji derî wê min tiştêkî din nekiriye.

*Amed Tîgrîs: Ji derî we, li ser navê Îraqê li kîjan welatî konsolosên kurdan hene?*

**Ahmed Bamernî:** Ji bilî Stockholmê li Holanda, Avusturya, Kanada, Tûnûs, Romanya û Çînê hene.

*Amed Tîgrîs: Ez dixwazim bipirsim, hûn ji berê ve wek nûner, kadro û beta li Parlamen-toyê xebitîne, lê niha wek konsolos dixebitin, çi ferq di navbera diplomasîya we ye berê û niha de hene?*

**Ahmed Bamerndî:** Belê, me berê jî karê weha kiriye. Mesela ez li Farnsayê bi salan nûnerê Yekitiya Nistimanî Kurdistanê bûm. Her têkilîyên me bi wezaretên derve, dewlet û partîyan re hebûn. Min li Brukselê ji karê dîplomasîyê kiriye. Ez çar salan li wir bûm. Wê wextê em yek kes bûn an jî du kes bûn. Hingê em li ser navê partî an jî rêxistina xwe diaxivîn. An jî li ser navê herêma Kurdistanê diaxivîn. Nûke rewş ne weha ye. Em teqrîben 30 kes li vir kar dikin. Bi kesekî re karkirin û bi 30 kesan re karkirin başqe ye. Ya din jî hindêk kar hene ku me berê nedikir.



Ali Çiftçi û Ahmed Bamernî

Foto: Amed Tîgrîs

**“ Nûke mesela kurd  
gehiştiye merheleyeke  
pir bilind. Pêşketîye.  
Hemû dizanin ku ez  
kurd im. Ew dizanin  
li Iraqê roleke kurd a  
giring heye. ”**

Li vir dewlet e, mirov mesûlê karê xwe ye. Di gelek rewşan de lazim e ji Bexdayê re binivîsim, ji wezîran re binivîsim û bêjim ez

filan tiştî bikim an nekim. Divê destûr wergerim. Raportan ji wan re binivîsim.

Belê, berê ku ez bibim balyoz me kar dikir, lê em heta radeyekê serbest bûn an jî bi serê xwe bûn. Lê nûke ne weha ye. Mesela ez bixwazim biçime bajarê Malmö lazim e ku ez ji wezaretê xaricî ya Iraqê re binivîsim, bêjim ez dixwazim biçim Malmö.

*Amed Tîgrîs: Berê we wek kurdekî berpirsyar kar dikir, lê niha hûn hem kurd in û hem jî kosolôsê Iraqê ne, ferqa berê û niha çi ye?*

**Ahmed Bamernî:** Berê nûka me wek kurd diaxaft. Nûke ez nûnerê Iraqê me. Yê hemûyê Iraqê me. Berê Mam Celal serokê



**“ Madê 140 bi tenê  
ne Kerkûk e. Ji bo  
ku Kerkûk girîng e,  
xelk behsa Kerkûkê  
dike. Saddam çendî  
parezgah(wîlayet)  
têkil kiriye. Hinek  
qeza ji yekê girtiye û  
daye ser ya din. ”**

Yekîtîya Nîştîmanî Kurdistan bû. Nûke Mam Celal serokê hukumeta îraqê ye. Kak Hişyar Zebarî nûnerê karûberê derveyê Partîya Demokrat a Kurdistanê bû, nûke Kak Hişyar wezîrê derveyê Iraqê ye. Ev Îraqa ku nûke heye ne Îraqa berî 2003an e. Iraqa nûke, Iraqa me ye jî. Lê di civînan de gelek xelk tèn pirsyanan li ser Kurdistanê dikin, em bersiv didin.

*Alî Çiftîçî: Bi vê ve girêdayî em dikarin pirs-  
seke weha bikin, mesela dîplomasiya ku îro  
li vir dibe, em bêjin li ser navê dewletekê kar  
dikî, di derheqê doza kurd de hûn rastî pirsên  
çawan tèn an jî hatine. Yanî mesela kurd di  
kîjan sewîyeyî de tê munaqesekirin?*

**Ahmed Bamernî:** Na, nûke mesela kurd gehîştîye merheleyeke pir bilind. Pêşketîye. Hemû dizanin ku ez kurd im. Ew dizanin li Iraqê roleke kurd a girîng heye.

*Amed Tigrîs. Mesela Kerkûkê niha aktûel e.  
Gelo çima referandûma Kerkûkê bi paş ve hat  
xistin?*

**Ahmed Bamernî:** Dema ku ji bo Kerkûkê danîbûn 6 meh dirêj kirin. Diviya bû di domayîka vê salê de referandûm bûbana, erebên ku di dema Saddam de li wir hatibûn cih-  
kirin, diviyabû vegerîna mala xwe. Kurdên ku dîsa di dema Saddam de ji Kerkûkê hatibûn derxistin, diviyabû bi paş ve hatiban Kerkûkê. Serjêriyek(hejmartineka giştî) çêbûbûya, nebû. Û hîngê referandûm çêbû-  
ban. Hemû weha man. Nûke Neteweyên Yekbûyî daxwaz kiriye ku 6 mehan dirêj bi-  
kin û ew jî rolek bibînin ku di tiştên praktîk de bikaribin alîkarî bikin.

*Alî Çiftîçî: Madeyê 140 pir tê munaqesekirin.  
Bi rastî naveroka vê madê çi ye?*

**Ahmed Bamernî:** Madê 140 bi tenê ne Kerkûk e. Ji bo ku Kerkûk girîng e, xelk behsa Kerkûkê dike. Saddam çendî parezgah(wîlayet) têkil kiriye. Hinek qeza ji yekê girtiye û daye ser ya din. Mesela Kerbela û Hille daye ser Enbarê. Hewlêr daye Mûsilê. Kerkûk daye Selahedînê. Madeya yek ev e ku van probleman hel bike. Çemçemal berê



qeza Kerkûkê bû. Kufri û Kela herdu dane ser Silêmanîyê. Tuzxurmat û çendên din dane ser wîlayeta Selahedîn. Mexmûr berê li ser Kerkûkê bû, daye ser Mûsilê.

*Alî Çîfçî: Ez dixwazim piirseke cuda bikim. Bi kuştina Benazîr Buto re hinek tiştên din ji ketin rojevê. Çendek berê we di axaftineke xwe de gotibû ku Benazîr Buto gotiye "alîyeke min digihêje kurdan." Hûn dikarin piçek behsa vê bûyerê bikin?*

**Ahmed Bamernî:** Ev bi vî şiklî bû. Em wek Yekîtiya Nîstîmanî Kurdistan beşdarî kongreyeke Soyaldemokratan a navnetewî bûn. Ez û Dr. Latîf nûnerê me bûn. Kak Latîf nûka wezîre av û avdanîyê ye. Kak Hişyar

**“ Dapîra min kurd e. Dapîra min xelkê Kermanşahê ye. Kurdên şii ne. Wextekê hatiye Necefê. Li wir bapîrê min dîtiye û li wêrê şû pê kiriye. Ji wir hatine Pakistanê. Piştir li min û li Dr. Latîf mêze kir, çavên me herduyan jî piçek şîn in. Got: -Hûn dizanin dema ez gênc bûm porê min kej bû. Digotin te ev ji kurdan girtiye an jî ji kurdan hatiye. ”**

“... ez gelek caran  
li ser raya xwe israr  
dikim. Ji min re  
dibêjin: te ew jî ji  
kurdan girtiye.”

Zebarî li gel Dilşad Mîranî ew jî nûnerên Partî Demokratên Kurdistan bûn. Evara roja pêşî resepsiyoneke mezin çêbû. Di vê navberê de nûner digerin û kurt kurt sohbet dikin, hevdu nas dikin. Ji xwe armancê resepsiyonê jî ev e.

Min dît ku Kak Hişyar û Kak Latîf li gel hev in û dikenin. Ez çûm ba wan û min got hûn bi çi dikenin? Gotin hinek dibêjin esle Benazîr Buto kurd e. Min dît ku Benazîr Buto li wir, li gel zelamekî dipeyîve. Min got baş e, ez ê biçim silavê lê bikim.

Ez çûm min got navê min Ahmed Bamernî ye û ez nûnerê Yekîtîya Nişîmanî Kurdistanê me. Wê jî bi xêr hatin li min kir û di wê wextê de Dr. Latîf û Kak Hişyar ji hatin. Min Hişyar Zebarî û Dr. Latîf pê da nasandin. Me jê ne pirsî, her wê jî me re got: Hûn dizanin dapîra min jî kurd e. Me got wele me tiştekî weha bihistibû, lê me fedî kir ku ji te re bêjin. Got, na, na dapîra min kurd e. Dapîra min xelkê Kermaşahê ye. Kurdên şîî ne. Wextekê hatiye Necefê. Li wir bapîrê min dîtîye û li wêrê şû pê kiriye. (pê re zewicî ye.) Ji wir hatine Pakistanê. Piştê li min û li Dr. Latîf mêze kir, çavên me herduyan jî piçek şîn



Benazîr Butto  
(1953 - 2007)  
kevneserokwezîra  
Pakistanê û  
seroka Partiya Gel  
a Pakistanê bû.

in. Got, hûn dizanin dema ez gênc bûm porê min kej bû. Digotin te ev jî kurdan girtiye an jî ji kurdan hatiye. Got ez gelek caran li ser raya xwe israr dikim. Ji min re dibêjin ” te ew jî ji kurdan girtiye.”

*Amed Tigrîs: Me di serî de got ku em li ser navê kovara Bîrnebûnê hatine û kovara Bîrnebûnê kovara kurdên Anatoliya Navîn e. Gelo we wek sîyasetmedar berê jî dizanibû ku li herêma, Qonya, Enqere, Qirşehîr û derûdorê kurd hene?*

**Ahmed Bamernî:** Belê çawa! Çendin care ez çûme Stenbolê û li wir kurdên Anatoliya navîn nas dikim. Bi sedan heval min hebûn li wir. Hevalekî min hebû di qezayeke trafîkê de mir. Ew di sala 1991-1992an de hatibû Kurdistana Iraqê. Dema ez dihatim Stenbolê em li gel hev bûn. Navê wî Hesen Deniz bû.

*Alî Çiftîçî: Bîrêz Bamernî, ji bo ku we dema xwe ya hêja ji bo me veqetand û ji bo van zanînan û agahdarîyên we, em li ser navê kovarê ji we re spas dikin!*

**Ahmed Bamernî:** Spasxweş!

# Konferansa zimanê kurdî ya netewî

Nuh Ateş

Ji sedî çend kurd (jin, mêr, zarok) li Kurdistanê (Bakur) û li koloniyên kurdan ên li dervayî Kurdistanê di jîyana rojane de bi kurdî (kurmancî) dipeyîvin? Ji sedî çend kurd dikanin bi kurdî bixwînin û binivîsin? Rewşa peyîvîna bi kurdî li gund, bajar, qeza, qeseban di çi halî de ye û di navbera wan de ferq heye? Dereceya asîmîlebûnê ji aliyê zimên ve di kîjan qonaxê de ye? Meriv dikane rêza pirsên hana dirêj bike. Tahlî ew e ku ev pirsên hana bêbersiv dimînin an jî bersiveke têr nabînin, ji ber ku li ser wan tu lekolinên berfireh û îlmî û rapirsînên representantîv tunin ku hene jî min hay jê nîne. Li ber çavan e ku bêyî lêkolîn û rapirsînên bi vî rengî û encamên ji wan derketî meriv nikane bi awayekî zelal rewşa ku ziman têde ye li ber çavan raxe, hîmên siyaseteke bi serî û binî di vê derbarê de nîşan bike û gavên ku di pratîkê de bêne avêtin hilde an bi nav bike. Kêmasiya mezîna di derbarê zimanê kurdi de va ye. Ji ber vê jî dayîna bersiva pirsên ku AMÎDAKURD sewa mineqeşeya li ser mijara asîmîlasyonê avêtine meydane ne hêsan e.

Bingeha dîtin, analîz û tespîten ku em li ser zimanê kurdî û pirsgirêkên wî

li Tirkîyê dikin pirtir çavdêriyên kom û kesan in û lokal in. Ji hinek çavdêriyan meriv pê dihese ku berê zimanê kurdî çi li Kurdistanê çi li metropolên Tirkîyê ber bi bîrbûn û wendabûnê ve diçe û prosesa asîmîlasyonê û otoasîmîlasyonê bi lez û bez bûye. Sedema sereke ya vê pêvajoyê, siyaseta asîmîlasyonê ya Tirkîyeyê ye ku ji destpêka demêzirandina xwe ve pêk tîne.

Meriv dikane kurdî li Tirkîyeyê di statuya zimanekî malbatî de bibîne.

Guhêrînen coxrafi, mijarên debarîkirinê, ji gundan barkirina bajar û metropolan û destberdana ji mijûliyên kevn wekî çandinî û pezxwedîkirinê, pêvajoya wendabûn an tunebûna zimanên ku bi tenê li nav malan tên axaftin, bi lez dike.

Ji hêlekê ve jî, bîst-sî sal in ku li Tirkîyeyê her çi qas li gor nifûsa kurdan bi gîştî hindik be jî hêjmara kesên ku bi kurdî dixwînin û dinivîsin sal bi sal hildikişe. Divê meriv têkoşîn û berxwedana, rêxistin, sazî û kesên kurd û hewldanên cûr bi cûr ên ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdi biçûk nebîne. Lê tunebûna siyaseteke zimên a neteweyî û yekbûyî ya rêxistin û sazîyên kurdan kêmanîyeke din a li ber çavan e.



Gelo çima civata kurd bi xîret û bi awayekî sîvîl û xurt xwedî li zimanê xwe dernakeve, ranabe ser pîyan û ji bo perwerdeya bi kurdî bi hezaran danakevin meydan û kolanan? Ma pêdiviya kurdan li Tîrkiyê bi zimanê kurdî tune ye an çiqas heye?

Bersiva van pirsan jî ne hêsan e û meriv nikane di çarçoveya vê nivîsarê de dûr û dirêj li ser bisekine. Ziman ne tenê şana hebûna milletan û kultura wana a cuda ye. Her weha ew jî bo her çêşîd ragihandin, perwerde û pêwendiyên aborî û bazirganiyê, navgîneke giring e. Rûmeta zimanan bi giranî li gor bazara wan tê pîvandin. Ji ber vê jî zimanê ku bi tenê li nav malan tê axaftin bêkêr tên dîtîn û pirê caran xwediyên wan jî lê xwedî dernakevin.

Rol û têsîra zimanê tirkî jî, di jiyana kurdên bakur de mijareke giring û bi serê xwe ye. Li gor çavdêriyan, meriv dikane îdîa bike ku piraniya kurdên bakur qet nebe ji aliyê xwendin û nivîsandinê ve baştir bi zimanê tirkî dizanin û debara xwe pê dikin. Eger wisa ye, hingê gerek e ku meriv li ser vê mijarê hûr û kûr bifikire û hewl bide ku têbigihêje ka ev rewş li ser pêvajoya tunekirina zimanê kurdî çî tesîrê dike.

Çî rêxistin û çî sazî, bi serê xwe şîya nake ku xwe bide ber kar û barên giran

ên zimanê kurdî û bi ser keve. Gerek e ku ev mîna wezîfeyek milî were dîtîn û biçûk û mezin, rêxistin û saziyên kurdan gişt bi hev re li hember êrîşên siyaseta asîmîlasyonê ya li ser zimanê kurdî derkevin.

“Li mala xwe bi kurdî bipeyivin!”,  
“Xwendin û nivîsandina kurdî hîn bibin!”,  
“Siyaset û îbadeta xwe bi kurdî bikin!”  
Pêşniyaz û şîretên bi vî tonî herçiqas di cîh de bin jî, pir tîn gotin. Lewma ez naxwazim wana dubare bikim. Pirs ew e ku ji vana û kar û xebatên ku şexis, rêxistin û saziyên kurdan jî bo zimên dikin bêtir, çî pêwîst e were kirin?

Encama ku ez ji van kurtegotin û tesbîtên li jor hatine kirin derdixim, ew e ku ji bo pêşî li ber tunekirina zimanê kurdî bê girtin û pêlên asîmîlasyonê yên har bîn bendkirin, tenê rêyek heye. Ew jî qebûlkirina kurdî wekî zimanê perwerdeyî, qet nebe wekî dersa ferz a kurdî di dibistanan de ye. Ji bo bidestxistina vê armancê, pêdivî bi hêzeke mezin heye. Hêzeke wisa ku li ser siyaseta Tîrkiyeyê ya derbarê zimanê kurdî de tesîr bike û bikane wê bide guhêrandin.

Ma hêzeke weha dê bi çî awayî peyda bibe?

Ez bersiva vê pirsê di lidarxistina **KONFERANSA ZÏMANÊ KURDÏ YA NETEWÏ** de dibînim.

Lidarxistina konferansek weha çiqas realist e?

Ez jî nizamim, belku jî ne mumkun e û xweşxeyalek be! Lê ji pêşnîyazkirin û qalkirina wê tu zîyan nagihê zimanê kurdî. Bi ya min hêza ku min li jor qalkir tenê dikane ji yekîtiya kar û hewldanên hemû şexis, rêxistin, sazi û dezgehên (partî, enstîtu, weqîf, komele, kovar, rojname, radyo, televîzyon...) di warê zimên de peyda bibe. Konferansa Zimanê Kurdî dikane bibe zemîneke baş ji bo pêkanîna yekîtiyeke hana li ser bingeha parastin û pêşvebirina kurdî. Di konferanseke weha de guman heye ku hemû aktorên di vî warê de bi hev re li çareyên pirsîgîrîyê zimên bigerin û kar bikin.

Konferansa Zimanê Kurdî divê ji du (an çar) salan carekê bicive û wekî saziyeke bi serê xwe û herdemî bê meşandin. Di sêrî de pêwîst e ku beşdarên Konferansê li ser Zimannameyêke siyasî ya

ku tê de armancên konferansê û rêya bidestxistina wana cîh digrin li hev bînin. Di her kombûna konferansê de raporek li ser rewşa zimanê kurdî û kar û xebatên derbarê zimên de bê pêşkêşkirin. Wekî din pêdivî bi plan û programekî li ser kar û xebat û hewldanên siyasî ji bo bidestxistina mafê perwerdeya bi kurdî li dibistanên Tirkiyeyê heye.

Konferans dikane îmkanan ji bo lêkolîn û rapirsînên derbarê rewşa zimanê kurdî û pirsîgîrîyê wî de peyda bike.

Ma kî dê banga konferanseke bi vî rengî bike?

Saziyên wekî Enstîtuya Kurdî Li Fransa, Enstîtuya Kurdî li Belçîka, PENA Kurd, Enstîtuya Kurdî Li Stembolê û Kurd-Kav Li Stembolê li ba pira-niya kurdan bi xatir û bi qedir in. Lewma ger bixwazin, baştir e ku ew bi hev re pêşengiya vî karî bikin.

Elmanya, 18.10.2007

## Bazirganên dînê Îslama hêja!

Xwendevanên Bîrnebûnê yên hêja û birûmet!

Em di demek giran û germ de dimeşine. Îro dîsa hebûna me, hinekan nerehet dike û dixwazin ku bi hemleyeke dawî hebûna me ji holê rakin.

Îro gelê me di destê çeteyên îxanetê yên weka Fethullahçîyan de bûne leyîstok û di bin navê Îslamê de gelê me ji nasname û ji çanda xwe tê ji dûrxistin. Weka ku hûn ji dizanin îro hêzên tarî di pêşdarîya *Samanyolu TV* û rojname *Zamanê* hêrişek bêînsaf li hember ziman û çand û hebûna gelê me dest pê kirine. Herroj di rojname û televîzyonê xwe de va çeteya devbixwîn heqeretê li gelê me dike û dixwaze hebûna me di bin maskeya Îslamê de bifetisîne.

Em li vir bala gelê xwe yê Mislîman dikşînin ser vê yekê ku yên ku me qebûl nakin, birayên me nîn in. Herçişes navê wan mislîman be jî, dîsa jî eleqaya wan bi Îslamê ve nîne.

Çawa ku di nav gelê me de li hember Nemrûdan tim hinek Îbrahîm derketine, li hember van hêrişên bê însaf, hin zarokên bi rûmet û bi heysîyet ên vî gelê bêtalîh rabûne ser lingan. Û bêyî ku menfeet û berjewendiyên wan ên maddî hebin, bi îlm û bi huner û bi pênûsên xwe berxwedaneke xurt li hember vê

asîmîlasyon û hemleya tinekirina gelê me derketine.

Her nivîskarekî Bîrnebûnê jî yek ji wan lehengan e. Lewra bi taybetî gava ku hinekan hîsabên gemarî li ser gelê me yê Anatolîya navîn dikirin û ew weka helandî û asîmîlekîrî hîsab dikirin, hinek ewladên fedakar ên vî gelê bêtalîh rabûn û kovarek wek Bîrnebûnê weşandin û li hember bîrbûn û wendabûna me tova berxwedanê çandin.

Gelê me di aliyê çand û hunerê de gavên mezin avêtine. Neyarên hebûna me fam kirine ku êdî ew bi înkare nîkarin me wenda bikin, îcar jî dixwazin di bin navê Îslamê de gelê me ji nasnama wan dûr bixin.

Ji vir û pê de xebatek xurt bo xizmeta dîn û gelê me ji me tê xwestin. Hewce ye ku em gelê xwe yê Mislîman ji destê çeteyên terîqet û cemaatên ku dijminê gelê me ne, bifilitînin. Vê jî tenê em bi hev re dikarin bikin. Lewra va ziman û va çanda ne tenê ya beşekî vî gelî ye. Yên ku îro zêdetir muxtacê hişyarîya netewî ne, dîndarê vî gelî ne û hewce ye ku her beşê gelê me jî di vê bareyê de çî ji destê wan tê bike.

Bi silav û rêz  
Hilmî Yeşiltaş

# Klîbên hunermendên kurdên Anatolîya Navîn

Amedekar: Muzaffer Özgür

Kurdên Anatolîya Navîn (KAN) deh sal in herroj ji bo ziman, huner, çand, sazî, malperên înternetê, tekilîyên gundîyên li Avrûpa pêşda terin. Ruhê netewî di nav wan da zêde dibe. Ji bo wan karûbarên navxweyî tesîr li rewşenbîr û hunermendan jî zêde dibe. Stranbêjên me herroj karûbarê xwe pêşda dibin û di nav hunera gelemkurd da cîyê xwe digirin. Karê cd. ên nû dikin. Di televîzyonên kurdî de, tv. li ser înternetê û YouTube da stran û klîbên wan tîr pêşkêşkirin. Tesîra muzîka KAN (Kurdên Anatolîya Navîn) li ser hunermendên Kurdistanê jî dibe. Ew di cd û klîbên xwe da stranên KAN dibêjin û bi wî awayî di bazara muzîkê de li alîyê me cî digirin. Mînak; *Koma Çar Newa, Dîyar, Bülent Turan, Ferhat Tunç, Koma Azadî* û yd. Şîrketên muzîkê mînak; *Kom, Aydın, Garip*, di berhemên xwe da cîh didin stranên kurdên Anatolîyê. Ez dixwazim di nivîsa xwe da wan klîbên tîr pêşkêşkirin bidim nasîn.

## Cejno:

Cejno ji Cihanbeyli-Kelhesen/Turanlara ye. 20.03.1964an li Gundê xwe jî dayîk bûye. 30 sal in di nav karûbarê muzîkê da ye. Heta niha du cd, bi navên *Keça Bênav* (Kom Muzîk) û *Yar û Teat* (Aydın Muzîk) derxistin. Ev 23 sal in li Swîsrê dijî. Demekê di Roj tv ê da berhemên muzîkê jî çêkirin.



## *Klîbê 1.:*

**Navê klîbê:** Av Sar Kanî

**Muzîk û gotin:** Cejno

**Cihê hatî kişandin:** Yalova û Diyarbakır

**Derhener:** Feyzullah Yıldırım

**Lîstîkwan:** Amatorên ciwanên Kurd



*Hêlê malan keve bang ke  
Şara reş bi ser buruyan ke  
Kulek hatî li dilê rezîl  
Wêre bi destî xwe derman ke*

*Kanî kanî avsar kanî  
Bejna zirav wek siltanî  
Çavên xwediyê te birîjin  
Ku tu dane wî xizanî*

*Dilo her te bela xwe dî  
Çavên girî nazli nedî  
Gotin nazlî ya te dane  
Rîya mi li ber şeyîdî.*

### **Klibê 2.:**

**Navê klibê:** Oy Oy Etê

**Muzîk û gotin:** Gelerî

**Herem:** Anatolîya Navîn

**Cihê hatî kişandin:** Celîl (Kuşça), Turanlar-Cihanbeyli

**Derhener:** Feyzullah Yıldırım

**Lîstikwan:** Gundîyên Turanlar (Dîya Cejno, Sibel Bozkır, Kerim Kılıç, Abdullah Turan-muhtarê gundê û çend kesên din.) Ji bo stranê li jêr rêza S. Kanat mêzeke.

### **Cengiz Acar:**

Ew ji Omera ye (Tavşançalı). Li yayla Bîrê Dirêj sala 1971an ji dayîk bûye. Dîbistana yekemîn (ilkkokul) xelas kiriye. Li welat hosteyê xaniyan bû. 20 sal in bi muzîkê ra mijul e. Çar sal in li Swêdê dijî. Heta niha bi navên; *Ji Omera, Bejn Ziravê, Dile Min û Tirba Min Vedîn* çar berhemên xwe derketine.



Albûma Cengiz Acar ya nû

**Navê Klîbê:** Evîndar im Nar

**Muzîk:** Kemal (Bülent) Küçükçelik

**Gotin:** Cengiz Küçükçelik

**Cihê hatî kişandin:** Tavşançalı-Bazarözû û Beşkardeş

**Derhener:** Gürsel Qemerî û Cengiz Küçükçelik

**Lîstikwan:** Jin: Taybet, Bilûrvan: Cengiz Küçükçelik, Zarok: İlhan û Nebi Acar (zarokên Cengiz in) û Gundîyên Beşkardaşê.

*Bejn zirav esmerê, vê min herî kuderê  
Serhildanam qederê, tu ji dilê min ne yî derê*

*Malam şevitî nar, birîndar im nar  
Dilem şevitî yar yaryar evîndar im nar*

*Şev e rinda min şev e, sibe li min nabe  
Ma bi dil miradî te be, dilê min bîrnabe*

*Çir bû rinda min çir bû, çima dilê min bîr bû  
Porê min li serê min gewr bû, umrê min teva bû*

## **Dogan Biçen:**

Foto: Rojname Yeni Özgür Politika  
(M. Alpavut 30.11.2006)

Doğan, ji Cihanbeyli-Kutugayê ye.  
1964an li Kutugayê ji dayik bûye.  
15 sal in di nav karûbarê muzîkê da

ye. Bi çend komên muzîkê ra kar kiriye. Heta niha kasetek bi navê *Neredesin-tirkî*- û dema endamê Koma Gül Dersimê bû ji kasetek bi navê *Çepki-Govend* derxistine. Hazirîya cd ê xwe ya nû bi zimanê kurdî dike. Ev 20 sal in li Almanyayê dijî. Heta niha klîbek çêkiriye. Strana klîbê dê di cd ya nû da ware



gotin.

**Navê Klîbê:** Ax lê dayê

**Muzîk û gotin:** Doğan Biçen

**Cihê hatî kişandin:** Köln-Almanya û Duhok-Kurdîstan

**Derhener:** Husên Hesên

**Lîstikwan:** Jinêpîr Rabia Serdaroğlu ji gundê Beşkardeşê-Kulu.

**Studyo Şef:** Fikret Dağ

*Birîna min kûr e wê derman e  
Welat dûr e têngê me  
Bi şev bi roj ez dinalim  
Xewna welat ji bîr nakim*

*Ax lê dayê wax lê dayê  
Tu ji bîra min qe dernayê  
Diçim diçim têngê me  
Bi şev bi roj hevîya te me*

*Dûrî welat jîyan zor e  
Meriv wekî ter ê kor e  
Bê dayik û bê welatî  
Bi xembarî sal dibore*



## **Koma Xelikan:**

Ergin û Osman

**Dema hat demizirandin:** Di destpekê da pênc kes bûn: Ergin, Osman, Muharrem, Ramazan û Mehmet. Hemû jî ji malbatekê bûn. Salên pêşda çend kesan dev ji grubê berdan û karê xwe bi alîyekî din da meşandin. Niha du kes in, Ergin û Osman. Navê xwe ji gund û eşîra xwe girtine. Xelika giredayîyê Kuluyê ye. Heta niha çar cd yê wan hatine derxistinê.

1.-Rindê, 2.-Pelê zer, 3.-Gula Mamê 4. Nalin. Du klîbên wan yê muzîkê hene.

*Gula Mamê û Ezî kal im*

**Klîbê 1.:**

**Navê Klîbê:** Gula Mamê

**Muzîk û gotin:** Gelerî

**Herem:** Xelika/Karacadağ-Kulu

**Cihê hatî kişandin:** Kulu, Xelika û Celîl (Kuşça)

**Lîstikwan:** Gundîyên Xelika

*Seda rabûm çik eyaz e, navê rindê lêlê Gulbeyaz e  
Me dizkî got eşkere nekir, Ma ew zalim ma nebîze*

*Gula Mamê Gula Mamê, Sipî dîke lêlê mîna camê  
Gula Mamê Gula Mamê tevde pîrse mîna camê*

*Destê xwe oy di destê min ke, hîv ji me ra lêlê bez-gavek e  
Wa zalimna kî cemere ma bi çavî min li te meske  
Wa zalimna kî cemere ma te ji destî min bigire*

*Gula Mamê Gula Mamê, Sipî dîke lêlê mîna camê  
Gula Mamê Gula Mamê tevdu pîrse mîna camê*



Albûma bi navê Nalîn



**Klîbê 2.:**

**Navê Klîbê:** Ezî Kal im

**Muzîk û gotin:** Koma Xelikan

**Cihê hatî kişandin:** Xelika-Karacadağ

**Lîstikwan:** Gundiyên Xelikan


*Baranek lê dibarîne, kulê dila derwa tîne  
Jikê ji te dur ketim, keser li min li kurbûn e  
Neman neman xayîn neman  
Jikê ji te dur ketim, keser li min li kurbûn e  
Neman neman qe çîst neman.*

*Ezi kal im lêlê lêlê, êdi çavên min nabinîne  
Destî min bigire lêlê lêlê, heyne bibe bigerîne  
Neman neman xayîn neman  
Destî min bigire lêlê lêlê, heyne bibe bigerîne  
Neman neman qe çîst neman.*

*Hesret mame bi ditîna te, keser giştik ji bo yê te  
Çend car mirim ji ber bi wê dilî, li ku derê qey tê bîra te  
Neman neman xayîn neman  
Çend car mirim ji ber bi wê dilî, li ku derê qey tê bîra te  
Neman neman ke çîst neman.*

## Murat Küçükavcı:

Murat ji Gundê Kutuga-Cihanbeylîyê ye. 1979an li gund ji dayik bûye. Dibistana lîse li Qonyayê xelaskiriyê û hatiye Danemark. 15 sal in bi muzîkê ra mijul e. 10 sal in li Kobenhagê dijî. Di sala 1998an da bi hevalê xwe Hayatî Özgünel (Kurdê Polatliyê) va Grub Civan ava kirine. Di nav KANê da ji bo dawet û şênahîya bi navûdeng e. Li Danemark pîrr çîyan kursên sazê (Tembur) dide. CDa xwe ya yekemîn bi navê „Çavreşa min“ li ser navê KOM muzîkê derxist.



**Navê Klîbê:** Çavreşa Min

**Muzik û gotin:** Nedim Dağ (ji gunde Kutuga) Afîşa nasandina cd ya nu

**Cihê hatî kişandin:** İstanbul

**Derhener:** Rodî

**Lîstîkwan:** Aliye û Murat

*Lê çavreşa min oyy bela serê min  
Estirkê çavê min oyy şeva dilê min*

*Dil dixapînin oyy lê venagerin  
Salên ten-terin oyy qe tu napirsî*

*Lê çavreşa min oyy bela serê min  
Estirkê çavê min oyy şeva dilê min*

*Şeva nêçara oyy timê bi hîv e  
Şeva dilê min oyy çima vê hîv ê*

*Lê çavreşa min oyy bela serê min  
Estirkê çavê min oyy şeva dilê min*



## Osman Yılmaz:

Di sala 1966an li Omera (Tavşancalı) ji dayîk bûye. 10 sal in bi muzîkê ra mijul e. Li Avustiryayê (Nemsa) dijî. Di klîba xwe da bi hevala xwe ya pêra dilîze düeteke jî dikin. Heta niha pênc berhemên xwe bi navê;

1. *Eşîreta Qonya*, 2. *Esrê bîsta*, 3. *Ve te nabim*, 4. *Zelîxa min*, 5. *Rojê reşê* derketine.



### *Klîbê 1.:*

**Navê Klîbê:** Zelîxa Min

**Muzîk û gotin:** Fatih Deveci, (Serrastkirin: O. Yılmaz)

**Cihê hatî kişandin:** Cihanbeyli-gundê Însuyu

**Derhener:** Şeref Akgül (Wekfilm)

**Lîstikwan:** Osman Yılmaz, Serpil, Abdullah, Ahmet (Endamên Koma Awaz), û Fatma Kara, Latife Kara û Ömer (ji Incovê ne), Kadir Yılmaz (ji Omera).

*Anê dilê min pîrr dêşe ye  
Kanî rinda min kanî le ku ye  
Anê dilê min pîrr dêşe  
Ka zelîxa min oy oy kanî le ku ye*

*Mi ra got lawiko tu min bîrbike  
Ez te ji bîrnakim were serê min jêke  
Mi ra got lawiko tu min bîrbike  
Ez te ji bîrnakim were serê min jêke  
Erê lo lo lawiko tu min bîrbike  
Ez te bîrnakim tobe serê min jêke*

*Zelixa min mîna gulekê ye  
Spî dikê mîna berfe ye  
Çavê min da meleke ye  
Ew rinda min e oy oy zelîxa min e*

*Çend sal in min ew nedîye  
Ji ber çavê min wenda bûye  
Çavê min çîya çîya banîya  
Dilê min dêşe anê serê min dêşe*

*Daka min ne da, tu min bîrbike  
Ez te jibîrnakim were serê min jêke  
Bawê min ne da, tu min bîrbike  
Ez te jibîrnakim were serê min jêke*

## **Klîbê 2.:**

**Navê Klîbê:** Were were

**Muzîk û gotin:** Xelikanli Hecko (ji Xelika-Gölyazi)

**Cihê hatî kişandin:** Adana

**Derhener:** Hasan Akgül, (Wekfilm)

**Lîstikwan:** Ilyas, û karkarên WekFilm (Zübeyde, Şehmus, İbrahim, İsmail, Murat).

*Tu gulêkî bîn tedî min  
Mîna royek tîn tedî min  
Hele were bi nîvan be  
Cî te he ye li ser serî (çavên) min  
Were were were were carek were xwe bimirînê  
Bila çavên min bibîne  
Agirê dilê min vemirîne  
Havîn, bihara min dilê, zivistana min biterkîne  
Min xevneka xwe dî yî bû  
Çi şîrîn çî delal bû  
Dema bixwe ez vesîyam  
Xanê li ser min xelîbû*



## Serbilind Kanat:

Ew bi xwe memosteyê matematîkê ye. Ji Cihanbeyli-gundê Buldukê ye. Hobîya xwe muzîk e. 25 sal in di nav karûbarê muzîkê da ye, karê xwe bi hevalê xwe Şavaş ra tevûhev dikin (Şavaş sazband e, ji gundê Xelikan-Karacadaxê û doktorê dirana ye). Li Enqereyê dijîn. Serbilind dawîya îlonê şunda gund gund gerîya ye berhemên hêja berhevkirine û arşîveka xwe heye. Heta niha şeş kasetê xwe derketine.

**Navê Klîbê:** *Oy Oy Etê* (Ne klîb e. Ji konserta li tv hatî dayin pir caran tê xastin).

**Muzîk û gotin:** Gelerî-Anatolîya Navîn

**Berhevkar:** S. Kanat

**Cihê hatî kişandin:** Studyo ya tv.

*Oy oy etê oy oy etê  
Keça rindik dilê min ketê  
Birin danê lawikê metê  
Serê dil xençer ketê*

*Berê mala bavê te mermer e  
Tû di sera here were  
Êkî bi dilî xwe nezewicî  
Mirin jera zêrê zer e*

*Şevê reş e ditirsime  
Eyam sar e diqeflîme  
Kî di navbera dilî me keve  
Mala bavê ar pê keve  
Sibe zuye sibe zuye  
Li ber malê dawestîye  
Xelk û alem gî dizane  
Min û teva dil girtîye.*



# Jinên kurd di serdema osmaniyan de

Îkram Oguz

Kingê ku mêvanekî/ê min were û li kitapxaneyaya min binêre, kitabên nivîskar û lêkolînerê hêja Mehmet Bayrak bala wan dikişîne.

Refek ji kitapxana min tenê ji kitabên Mehmet Bayrak pêk tê. Her kitabek wî jî ji 500 rûpelî kêmtir nînin û hemû jî bi formên mezin hatine çapkirin.

Ji ber vê yekê ye ku kî wan kitabên Mehmet Bayrak dibîne, hevîkî xwe şunda didin û dipirsin:

- Tu van kitabên Mehmet Bayrak çawa dixwînî?
- Ev qalindîya kitabên wî çavê te natirsîne?, hwd.

Bi rastî, ew ji van pirsên xwe neheq jî nînin. Mezinbûn û qalindbûna kitabên Bayrak, bêguman çavên mirovan ditirsînin, lê belê dema ku mirov dest bi wan kitabên dike, mirov xwe di nav dîrokê da dibîne û winda dibe... Serrastkirina rê jî heta dawîyê bi xwendina wan ve mimkûn e..

Ji wan kitabên wî yek jî, kîtaba wî ya nû ye û bi navê "Osmanlı'da Kürt Kadını" *Jinên kurd di serdema Osmanîyan de* ye û bi tirkî û kurdî hatîye çapkirinê.

Kitap ji 240 rûpelan pêk tê û di her rûpelekê wê da resmek yan jî gravurek cîh digre. Piraniya resm û gravur ji çavkanîyên bîyanî hatine girtin û her resm û gravurek bi serê xwe tenê di derheqê jinên kurd da agahîyên bêhempa didin...

Kitap ji şeş beşan pêk tê. Ew jî:

„*Bi Gravur, wêne û kartpostalan jina kurd*“

„*Ji duh beta îro jina kurd.*“

„*Ji bêla Meraşê amazoneke kurd Fatareş.*“

„*Bi gravuran jinên kurd*“

„*Di wêneyên osmanî û rojava de jinên kurd*“

„*Di kartpostalên osmanî de jina kurd*“ in.

Di dawîya kitabê da jî çavkanîyeke hîlbijartî li ser gravur, wêne û kartpostalên kurdên osmanî cîh digre...

Mehmet Bayrak di pêşgotina kitabê da dibê: „... Bingeha vê xebatê li ser *Di serdema osmaniyan de jinên kurd* hat danînê, pê re jî me cîh da hin afrandinên balkêş yên wênekêş, lêkolîner û gerrokên rojavayî. Divê em car din bêjin, ew dîyardeya *jinên rojhilatî* ku ji alîyê ronakbîrên rojhilatî ve qet nehatiye bahskirin, pêşekî rojavayîyan anîye rojevê.“

Ez naxwazim bi dur û dirêj pesnê kitabê bidim. Bi rastî ew bi kurtenivîsekê jî ne mimkûn e. Lê ez dikarim tiştêkî din bêjim. Mehmet Bayrak di destpêka kitabê da dibê, „*Ez vê berhemê ji bo pêşniyara nivîsandina vê pirtukê dîyarî xanima xwe Gulay û hemû jinên kurd dikim.*“

Ez jî wek xwendevanekî Bayrak, xwendina vê kitabê pêşniyarî ne tenê jin, hem û jin û mêrên kurd dikim...

Ji bo destxistina kitabê:

**Weşanên ÖzGe**

[www.ozgeyayinlari.com](http://www.ozgeyayinlari.com)

[info@ozgeyayinlari.com](mailto:info@ozgeyayinlari.com)

# NİSTÎ

Mem Xelîkan

**Nîstî**; perçeyek ji kultura (çand) gela ne. Lê; ji kultura wana yê batilî (xurefe) ne. Pir caran, însan wana ji tirsên xwe re bi cih tîne. Wek çavpêva dayîn (nezer) an jî; ji oxirê re wana tîne şûnê û ji wana parastinê dipê. Meri, bû xwedîyê tişteki li cem herkesî nayê dîyinê, nistiyên xwe tîne şûnê, ji bo ew tişt û mal-milkê ew bûyî xwedî li vî û malbatâ vî bi xêr û bi oxir be û nê nezerkirin. Her gelekî, bîrûbawerîyên wana yên batilî hene. ew bîrûbawerîyan li cem kurdên Anatoliya Navîn jî hene. Lê li cem kurdên Anatoliyê ew bîrûbawerîyên em jê re dibên NÎSTÎ hê zêde ne. Ji bo ku, ew nistiyên piraniyên xwe têda dexwaz (dilek) hene, û ji bo oxirê ne, min bi xwe û xwe digot; dibê ku navbera nistî û xurefa (batilî) da ferqek hebe. Ji bo wê yekê, ez çûm cem melleyê gund û mezinekî gund (Ev Hesê Elê jî melletîya xwe heye). Min ji herduyan jî pirsî, herduyan ji gotin; "nistî jî bîrûbawerîyên xurafe ne. Navbera wana de tu ferq tuneyê".

Em li nistiyên kurdên Anatoliyê mêzekinî; piraniyên wana, min li jor jî got, wek dergûşek hate dinê ku bûne xwedîyê mal û milkekî, li esker an jî rêwî bi rêkirinê ji bo nezer û oxirê ne. Nisti-

yên wana pir in. Berê, ew nistiyana hê pir bi cih tînan. Lê huro (îro) wana wek berê pir nînine şûnê. Ew jî, dibê ku girêdayîya pêşveçûyîna civakî, çandî û aborî be. Ez dixwazim, ji we re çend nistiyên ji wana binivînim.

## XWEDÊDAYÎNA KURÎKAN (ZAROK)

Kurikek hate dinê; siftê di guhê wî yî rastê de bang (azan), di guhê çepê de qamet tê xwendinê. Vaya, ji bo ku ew bizane dîn (ol) ê xwe Mihemedî ye. Dû vê Navê vî/wê, sê caran di guhê wî/wê de tê gotinê, zêrekî bi enîya wî/wê de û kinirikekê jî bi kincan de kin. Ku çelê xwe tiji kir, çel bi derdixînin. Ji bo wê jî bêjîngêkê di ser re digirin û bi bêjîngê çel kupe av di ser re dirijînin.

Ku didanê dergûşê bi der ketin, danîyê didana dikelînin. Wana ê danîyên kurik bibin li cîrana belav kin. Cîran jî yê pera bidin wana. Dergûş bi rê çû; yê kostekê biqetînin. Ji bo wê; li ber malê, kurikên cîranan yên 7-10 salî berhev bin. Mezinek dergûşê dike hemiza xwe û ya herdu pêçiyên dergûşê yên girikê bi benekî giride. Pêşa dergûşê tiji çerez ke.

Kurik ê bi meşeke bi lez di dora

malê re çerx bin. Kî zû hat, ew ê kostekê biqetîne. Û ew ê vî çerezê kurik li hev par kin û bixwin.

Jina zîstanî, çel rojan bi tenê bernadin. Quranê didin ber balgiha wê, derziyekê jî di yorgana wê re dikin. Wana ji bo albas-mê ne. Ji bo ku dergûş û dayik nexwaş nekevin. Jinên zîstanî, ku enfecte bûn, agirê bedena wana ya bilind bibe û yê ji ber alafê bi xwe û xwe (sapir- supir) deng kin. (Di tîbbê de, navê wê; püerperal enfaction e.) Li herda me jêre, albasme dibêjin.

## BÛK DERXÎSTÎN

Li biraq (Al) darxistinê; ji bo nezerê serê darî biraqê pizavekê pêda dikin. Ji bo bûk; xêr û bereketê bi xwe re bîne, ji mala bavê xwe de nanekê bi xwe re tîne. Bûk hate ber malê, di ser serê wê re, çerez û perê hûr velo (vala) dikin. Ji bo lingê bûkê bi oxir be; kefçiyekî darîni didin bin lingê wê û didin şikandin. Dîsa ji bo nezerê, kupekî camînî bûk ê bavê erdê û ya bişkêne. Ji bo bûk, xwedî kurik be dergûşek lawik didin dest.

## ESKER BÎ RÊ KIRÎN

Li esker birêkirinê; ji maleke bi oxir, nanekî tînin. Wî nanî, dikin qozî, serê qozî, bi esker didin geskirin. Qoziyê mayî, hetanî esker vedigere vedişêrin. Li çuyînê quranê dixwînin û cîran û hevalên wî pir- hendik, ji bo nistiyê pera dikin berîya wî. Ji bo ku rê ya wî, wek avê

bihêrike û jihev be, avê dû wî va diavên.

## MAL Û MILK

Malbatek an jî merîyek, bû xwediyê mal û milkekî, ji bo nezerê nistî hene. Yekî xaniyek çêkir yê bi temelê xanî de, berxekê serjêke û xwîne biherikîne temel. Maleke xwe stand; yê qurbanekê bike û nanekî bide cîrana. Ev jî ji bo çav-nezer û oxirê ne. Li erebe standinê jî, li ber tekerê wê qurbanekê serjêdikin û xwîna wê di tekara wê didin.

Ji vana bêtir jî hê pir nistî hene. Wek:

- Li pez û tereke wendabûnê, ji bo gur wana nexwe, devê gur girêdayîn

- Li dereke kes tuneyî, di şereşê da ji tîrsa re, bo pez melayke dibînin xwe di nav pez de veşartin

- Ji bo baran bibare, bûka baranê gerandin

- Li rêwîtiyekê, li dû rêwî ve av avitin

- Bo nezera, xwê gerandin. (Ji bo ku yek neyê nezerkirin; jinek ê çengê xwe tiji xwê ke, di ser serê wî re, ser sîng û pišta wî re xwê bigerîne û ya bê "tû tû" û wê xwê bi yên rûniştî tehmkirin bide û ya ku mayî jî bavê agir.)

- Kurik bi guhrepikê ketin; binguhê wana rejikirin

-Li zerikî bûyînê; navçavên (rûyê) wana jîletkirin û xwînberdan

- Li xeneqoqê; kurik navbera çalan (Bîrên genim û ceh) re derbaskirin jî, nistiyên Kurdên Anatolî ya Navîn in.

## Heyfên Beqan - 1

Uskî Cîmîk

Ro hatibû nîvro, li ezmana ne ewrek, ne dûmeqeskek, ne çûk û ne jî bazek hebû; tenê ezmankekî cûnî hebû. Buxeke qewr li ser erd û ezmana xwe bi pahniyê rêxistibû, her tişt di bin vê buxê gewr de zelal dihat xoykirin; gund, lod, çêre, çem, mirov, hemû reng û heywan.

Li dû rê, ezman û erd bi hevdû ve nûskîbûn, di navbera wan de wîqasê pozê derziyê xêzeke sipî û çend derên xwe şikeştî ji serî heta dawîyê xwe dirêj kiribû. Beybûnan serê xwe hîn di ber xwe de xwar nekiribûn; ne bayek, ne pêlek, ne pîrpirîkek û ne jî mêşek hebû. Li ser piyê rastê, çar çiyayên bêçêre, bêdar û bêzinar li hemberê hevdû bûn. Her çiyayekî sipî mîna ku bibêjî bi barîna berfê lep bi lep lod bûne, çend derên wan geliştî, dirî û qulî reş bûn. Her yekî wan wîqasî bostekê ji hevdû dûr bûn, mîna ku bibêjî ew bi derewan li wir danîn e. Ew dernan cihê neysizan bûn; çîma nizam, ew bi xof xoy dikirin, wextê ku te rind li vir mez dikir qirçeqirçek bi mirov diket. Di navbera wan de jî gundekî ji sî û çil xanî ji tirsan xwe topî serhev kiribûn û ew jî bi çend xaniyan ve kom bi kom ji hevdû veqetî

bûn. Xanî mina ku bibêjî ji kaxizên dirî û ji paçên qerçimî hatibûn çekirin. Pencereyên wan reş xoy dikirin, deriyên wan jî wekî qetranê bûn. Hina çatiyên xwe ji kîremîtên sor, hina ji qamiş û hin ji wan jî bêçatî bûn; ne mirovek, ne heywanek û ne jî darek li ber malan hebûn. Li hêla wan, çemekî dirêj, teng û zirav di nav hêşinayîyê de xwe dirêj kiribû û di navbera malan de, di navbera lodan de mîna marekî xwe badayîbû, ne çîkek, ne dengêk û ne jî livînek hebû. Çem tenik bû, di binî wê de kevir û qucik, kezv û beq û zinarên biçûk û gir xoy dikirin. Li hêla çem komek mirov civîyabûn; jin û mêr, pîr û kalik; ji wan ne dengêk, ne helhelek û ne jî raprapek dihat. Ew li vir mîna kevirê bel dawestiyabûn. Zinarekî gir û pahnik li peravê hebû û li ser wî jî beqeke wîqasî zinêr xoydikir. Beqekê hêşin, çavsor û pêçîzer bû; ne qûrqurek, ne şepşepêk û ne jî pêlên avê hebûn. Beqê mîna dëlegurê serê xwe hildabû, berî xwe ber ve gund bû. Rêêêêêêê li dûr ve, li ser piyê çepê, keriyekî pez di nav heşiniyê de xoy dikir, mîna ku bibêjî ew giran giran ber ve çem dihat.



...

Bi hatina pez re bayê destpêka havîne jî li ser heşînîyê re derbas dibû. Çêrê hîn nû heşînî li xe dikir. Û beybûna giran û giran serê xwe dihejandin. Dirêjbûna çêre heta çokê kerê boz dihat. Li ser kerê boz kulaveke sipî hebû û du sê çînên sor û heşîn lê hebûn, li ser wê jî tereke reng bi reng hebû û tê de bilûrek xoydikir. Li ser kerê şivanekî nêzikî bîst salî li ser hêleke xwe sîyarbû, hîn rih li wî nû xwê digirt. Porê wî heta milên wî dihat û bi bayê havîne ve pêl dida, li ser wî îşligî vêstû çendekî kurt û belek û şalekî riş lêbû. Du û sê pirpirîk di ser wî re firriyan û kuçikê qolîk û devriş jî bazdida ku wan bi devî xwe bigirê. Komek mêş û vizik jî li serê wî civîbûn.

Pêz serê xwe kirin ber xwe, bi gavên hur û bi lez ber ve çem dimeşîyan, pê re jî dengê ginciyan û bi yê zengilan ve tevlihev dibûn. Pezî ewqas çê bû ku dûvên xwe bi xwe re bi xora dikişandin. Pişqulên wan mîna moriyên tizbîyan yek bi yek jê diketin.

Bi hatina pêz beqê bazda nav avê û jî nişkave jî ber çavan com bû. Pez bi çokan diketin nav gîle û dûvre li perava çem rêzdibûn. Pezê devreş, guhreş, guhbel û enîbej lêv û devê xwe bi avê dikirin, kevza li rû avê bi hêlim û bi devê xwe belavdikirin, çilm li hêlekê û kevz li hêlekê diket.

Pêlên avê xwe didan dû hevdû, ne ji hevdû dûr diketin û ne jî nêzikî hevdû dibûn, yek ji yekê vedikişîya. Şivên jî xwe da ser zinarekî, gorê yê rêsînî jî li nigên xwe derxist û nigên xwe kirin nav avê û dest û piyên xwe şuştin şûn de xwe bi dev berda avê. Li perava çem, pez, şivan li hêlekê û kuçikê qolîk û kerê boz jî li hêlekê diketin.

Ro li ezman mina marekî vedilîst, ava çem dikalîya û bux li ser wê diket. Bi hezaran kelmêş li ser avê di nav xalan de dilistin.

Şivan li ser kulavê sipî xwe dirêjkirîbû, ew rabû, ji tere bilura xwe derxist û tiliyên xwe da ser kulan û dest bi lêxistina bilûrê kir. Dengê bilûrê li ser pez ket, ew ji cîyên xwe rabûn û yek bi yek hatin û ew hewşkirin û gîşt li dora wî mexel bûn. Dengê bilûrê li ser ava çem pêl bi pêl belavbû û avê pê pêl dida. Beqeke hêşîn, çav sor û pêçî zer ji ava derket û giran giran xwe li ajinîye xist û paşê li ser zinarê li perava sekinî û bi dengê bilure ve kir qûrequr. Şivên bi dengê beqî dest ji bilur berda, wî li der dorên xwe mezkir ku ev dengê beqê ji ku dere te ye. Çavên wî li zînarê li perava ket, wî li ser we beqê dî, ew hinek ecêb bibe jî qe hesê xwe nekir.

Şivên carî din dest bi bilurê kir û pêçek din şûn da beqê dîsa kir qure qur, çavên şivên êdî li wê bû. Wî dest ji bilure berneda û heta berêvarê jî beqê re bilur

lidixist. Dengê beqê û bilûrê wekî meqamêk bû.

Roka din şûn da, şivan dîsa hatibû çem û li bilura xwe xist, wî pir merak kiribû ku aya bi dengê bilura ve beq ji avê derkeve an ne. Dengê bilure hîn li ser avê neketibû beqa çav sor, heşîn û pêçî zer ji avê derket û wê xwe da ser zînê û kir qûrequr û serê xwe vê re hêjand.

Çend ro şûn de, bi dengê bilure ve çiqas beq yên bi reng bi reng di avê de bin, gîşt derdiketin ser zinaran û peravê û bi hevdû re dikirin qûrequr. Êdî her ro dengê wan dûne heydina.

Çend meh din şûn de, beqa çav sor, heşîn û pêçî zer a ji avê derketiya, di ser sê û çar miyan re jî bazdaya û bihatiya li ser çokên şivên bisekîniya û a dengê xwe bidaya rû bilure. Her ro, şivên ji wê re bi bilûrê kilama Eman Elo, Fat Qilotê û Efê bistira. Ji wê re ziravê Qamisê Qul lêxista û qala dilê keç û xortan bikira. Car carna jî wî ji wê re qala çêroka Mem û Zînê, çêroka Memê Alan û çêroka Çiyayê Sipanê bikira. Carna jî şivên li ser piştê, li ser çêrê xwe dirêj bikira û beqa bihata li ser sînga wî bisekîniya û bi tiliyên xwe serê wê û piştê wê mist bidaya û çavên wê ramûsiya.

Va dil e, qe ne kevçiyek şîr û bulxur e ku em we fêm bikin...

Bayêreş dihat, êdî destpêkirina payîzê

bû, destpêkirina koçêbû, her tişt xwe nû va dikir; çêre benz li xwe zer kiribû, ava çem tehlbû, zinaran kewz girtibû, pirça kerê boz û mû yên pez bi tele bi tele li ber bayêreş ketibûn, der dorê çavên kuçikê qolîk meş girtibûn. Dengê bilurê û yên beqan ne sarî, ne jî digotin tî û birçibûnî; havînek bi dengê wan pêl dabû.

Ro hatibû berêvarê, ji bilura şivên hîn dilop bi dilop hêstirk diweşiya. Pez êdî êdî yek bi yek radibû, li der dora xwe diçêriya. Kerê boz du-sê caran li ser çêre xwe nişkir. Şivên dest ji bilurê berda û xatirê xwe ji beqê xwast û got, "êdî paşiya havînê tê ye, em ê li havîneke din hevdû bibînin" û paşê wî çavên beqê paçkir û beqê bazda û ew kete nav avê.

Keriyên pêz ketin re, ji çem dûr ketin. Ro hema hema diçû ava û bi qûr qura beqan ewr giran giran xwîn digirt.

....

Di nav komê de, mêrekî bi simbêlên qalind û bi birûyên çik, çokê di destê xwe de li hewa bakir û pê re jî bi dengê xizokî bang dikir, 'birano!, xwîşkno! werin cem min!'. Di navbera levên wî yên qalind de cixareke hema hema li tewabûnê hebû û bi dumanê cixanê simbêlên wî pê rewisîne. Ji poz û bilivên wî re dumanê cixane derdiket û wî re jî du û sê caran pê dikuxî, mina ku 'motorê John Derê' derbas dibû.

Her kes li der û dora mêtîk civî.  
Mêtîk çav li xwe biçûk kir, çermê li eniya  
xwe qerçimand, pê re jî birûyên wî dake-  
tin ser çavan. Bi çavên hirs giran giran li  
kesên li der û dora xwe mezdikir, wexta  
ku stûyê wî li dora xwe çex dibû xirt xir-  
ta dengê hestiyên jê dihat. Li der dor yê  
wî dû se jin hebûn, ne zêde. Hemû mer-  
bûn, çend xort jî di nav wan de hebûn.  
Merik cixara di devê xwe de derxist û ew  
kir nav tiliyên xwe yê zer, du û sê cara  
pê lîst û paşê ew pekand, wê li hewa du  
û sê caran teqle avêt û hat li ber nigên  
xortekî ket, hîn jê dûman derdiket, wî  
xortî li der û dora xwe mezkir, paşê xwe  
xwar ve kir û dest avêt cixarê.

Bostek me ku êdî ro here ava û aso  
giran giran diheliya.

Merik bi zimanê xwe levên xwe dia-  
last, destê xwe ber ve devê xwe bir, du û  
sê caran kuxî û di qirika xwe de çî hebû  
qîşk derxist, ew di devê xwe de du û sê  
caran rast û çep çengand û paşê ew da-  
qurtand. Wî got , 'li çem rindmezkin' û  
pê re bi dest û piyên xwe jî çem ji wan  
re nimand, û got, 'emê hiro çem ji wan  
paqij bikin. Qe we bihîstiyê ku beq û  
mîrov ji hevdu hezdikin!?' Yê li der û  
dorên merîk civîn bi hevdu re gotin, 'ew  
çî şor e, ew eyîbekê mezin e.' Merik dîsa  
dest bi dengkirina xwe kir, 'Van çend  
meh in bi qerîn û bîhna wan em mirin,  
ma bîhn û dengê wan serê wan bixwin.  
Êdî bes e! Em ê hiro kokê wan rêş kin!'  
Yê li der û dorên merîk civîn bi hev-  
du re gotin, 'belê, em ê hiro kokê wan  
rêş kin!'

### Komela Altilera şeva xwe ya diduya li bajarê Udenheim Mainz - Almanyayê çêkir

Ahmed Gezer



Altiler gundekî Reşî ye û ji beşê Omerî ye, kevna digotin gundê herî kevnî ku cara sifte hatine Anatoliya Navîn ji duwe li gundên dinê Omerî bela bune. Ji ber ve bi pir gundên din re dan û sandinên xwe heye, meri û merdanê xwe jî li dor alî gundên din jî fere ye.

Mala Boybegê, Hesên Beg welîtî ya vê heremê dikirin. Cîyê ku lê Medrese hatî avakirin, pir kesan di vê medresê de xwendine û nişana Milletî sitandine. Avakirina medresa kurdî mûderris İbrahim Efendê

kiriye. Altılar hîro ji vê radeyê dûr e, dîsa jî insanên vî gundî ew cevhera di wan de heye ku ev çend sal in ji gundê xwe re li Avrupayê şe û şênayî çêdikin.

Însanên Altilera ji zû va fikrê ku li Avrupayê bi hev gên, di nav xwe de deng dikirin. Cara sifê li Almanyayê nêzikî 40 kesî li bajarê Limburgê hatin cem hev, biryar girtin ku komalekê ava bikin. Komale li Almanyayê li bajarê Dornburg-Frickhofenê di 22 januar 2006an de bi fermî hate îlan kirin.





Piştî vê di meha Gulana 2006an de, dîsali Almanyayê, li bajarê Rûsseinsheimê biryar girtin ku îşekî bikin.

Hedefa komala Altilera yên serekî ev bûn: gundîyên Altilera salê carekê bi şahîya şevakê bêne cem hev. Gundîyên Altilera hevdu bibînin û hev nas bikin, çand, ziman, ûrf û adetên xwe peşta bibin. Ji alî maddî de ji gundê xwe re bibin alîkar. Li gund pirtûkxane, cihekî ku kultura xwe nîşan dide (Mala çandî) ava bike.

Gundîyên Altilera seferasîftê li Almanayê li bajarê Kolnê di 04.11.2006an de şeva xwe çêkirin. Nêzikî 500 kes hatibûn şevê. Di vê navberê de gundîyên Altilera li Avropayê ketin nav kar û barekî ku

fêda bi gunde xwe bibe, di wexta kurt de ji Altilera re erebeka ku çopê berhev dike, tankera avê ku pê daran avde, ji depoya avê re makîna klorê standin. Der û dora gund pak kirin. Cîyê ku lê çop welakin, der û dor wê têl kirin. Di rojîyê de ji kesên xizan re paketên xwarinê çêkirin.

Di sala pêş me de, di devê biharê de, li gund nêzikî 2000 darî ê danin, dar li ser awayî daristana Qonyayê, hesin û têl li ser awayî Kaymakam, kolan kortan, kişandina têlanû avdana daran jî Komala Altilera li Evropayê helde ser milê xwe.

Roja şemîyê 03.11.2007 li bajarê Udenheim Mainzê, li Almanyayê şeva xwe ya duduya çêkirin. Nêzikî 400



kes tewa şahiyê bûn. Ji Denîmarkê, Hollandayê, Swisreyê û Avusturyayê xelkê Altîlera hatibûn şevê. Ji derveyî însanên ji Altîlera, ji gundên dorali jî tewlî şevê bûn. Ji Tawlî, Çoplî, Xelika û ji Kirkpînarê. Şahîya şevê bi kurdî û tirkî hat pêşkêşkirin. Şahî bi dengkirina Ahmet Gezer dest pê kir. Ahmet di dengkirina xwe de xêrhatina mêvanan kir û got: em we bi silavên germ, bi navê Komalê Altîlera ji vir heta gund bi germahî we silav dikinî. Di berdewamiya dengkirina xwe de Ahmet got: hedefên komala Altîlera yê serekî ev in; gundiyan Altîlera salê carekî bi şahîya şevê bîne cem hev. Gundiyan Altîlera hevdu bibînin û nas bikin, çand, ziman, ûrf û adetên xwe peşta bibin. Ji alî maddî ve ji gundê xwe re bibin alîkar. Li gund pirtûkxane, cihekî ku çanda (kultura) xwe nîşan dide ava bike.

Berpîrsiyarê Komala Altîlera Sînan Şener jî xêrhatin li mêvanan kir û şabûna xwe bi mêvanan re parve kir. Sînan di berdewamiya dengkirina xwe de zehmetî yê karên komalê anîn zimên û tenkî jî gîlî, lome û gazinên xwe kirin. Şevket Bakan, Îhsan Ercan û Hasan Kaymakçı jî fikrên xwe yê li ser komalê anîn zimên.

Me got mêvanên ji der dora alî Altîlera jî hebûn, jî Xelkê Qerecdaxê birêz Nuh Ateş bi navî Kovara Bîrnebûnê



hatibû. Ahmet Gezer birêz Nuh Ateş dawetî ser sahnê kir. Nuh Ateş di destpêka dengkirina xwe de got: mala we ava be, ji ber ku hûn ji gundê xwe û ji însanên xwe re îşên çê çêdikine. Nuh bi heneka ku di navbera Altîlera û Tawlî de derbas bûyî ji mêvanan re qal kir:

*Îwê Ravê Omê li rojîyê devdevê nîvro bi peya tere gûndî Altîlera û li vir Bilê Hesê Canê biwûne, navberê Altîlera û Tawlî şeş kîlometre ne.*

*Apê Îw tê mala keçîka Bile yê li hortî gund tevê nîvan, keçîka Bilê di ber hevîr da ye û nê nê ledixê. Apê Îw dikeve hûndirê malê û rûtenî. Penç û dehe deqa bi şûn da Bilê bangî keça xwe dike:*

*Keçê zû ke. Apê Îw î niha birçî ye. Jê ra çend kilorê rûnkirî çêkin. Ma bixwe.*

*Apê Îwê ve tewîze û tewê:*

*- Lo Bilo, Xwudekî bisekine. Ez tû tiştêkî naxwim. Him jî ez î bi rojî me.*

*Bilê çexa Apê Îw tiwe û tewê. Weng tewê. Ew çî şor e. Niha tu yê seferî yî. Rojî li te nakeve. Nanê xwe bixwe û zikê xwe jî rind têr bike.*



*Apê Îw î bi ser vê de tewê.*

*Weng e? Rojî niha li min nakeve? Ser vê pirsê Apê Îw kilorên rûnkirî dixwe û zikê xwe jî rind têr dike û bi ser da jî çayeka xwe jî wedixwe.*

*Apê Îw tenkê li wir rûtenê û ji duwa wedigire Tawliyê. Nêska mala xwe diwe û seata xwe mêze dike. Çend deqa bi şûn da îftar e. Gûndî yê rojîya xwe jêhevkinê. Dikeve hûndirê mala xwe, mêz dike ku*


*xorantê mala xwe li ser sifrê ne .*

*Heman li sifrê rûtenê û tewê: Hîro rojî bi min çiqas zor hat. Heyata xwe de wiqes birçî nebûm.*

Nuh Ateş çend hêkatên din jî ji Xelka gotin û ji duwa jî dengkirin anî ser zimanê kurdî û kurdan.

Nuh got: li gunda her malekê dûrîkî xwe heye, her malekî dûrî û rengê arengê xwe ne wek hev in. Ji ber ku bi hêsanî wera naskirin. Me kurdan jî rengê me dengê me, çand û zimanê me heye. Em jî dixwazin bi wan deng û rengên xwe werin naskirin. Mîna mirovên hemû dînê em jî heq û huqûqa xwe dixwazin.

Şeva Altîlara bi hûnermend Cengiz Acar û Muzaffer Yigit heta derengê şevê bi stran û govandê berdewam kir.



## ÇI BÛ

### Mem Xelîkan

Bê me roj hilnedihat  
Ne diçû ava  
Ji çelengîya te  
Hîvê asîman terk kiriwû  
Dernedikete şeva  
Berfa diqefilî  
Ji sewdaya me diheliya

Li hevdîtinên şeva  
Hûr hûr dibarî baran  
Wek rondikên çavê bedewa  
Ji jiyaneke bi rûmet ra  
Tiji wûn paşilên me ji hêvîyan

Huro  
Jiyan bi qar û bar  
Xevên şeva bi nîvin e  
Emrekî stuxar  
Xevnên min birîndar  
Tu gula berbiharê  
Bi naz  
Ez şivanekî kal  
Bê bilûr û bê saz.

2007

## WÊ ŞEVÊ

şevê îne

min kul huv allah u ehad du caran zêda xwand  
û orxan kişande serî xwe

herşev

berî ku ez rakevim

min bîsmîlah û kul huv allah u ehad se caran dixwand  
min duxe

ku xwandin bi şunda

edî bi kesî re deng nedikir

ji bo ku navbarê min û xwedê kes nekevê

û tekiliyê ku min bi xwedê re dagirtî ma nekete

roja îne

serî sibê zu rabûm û cume mektebê

rojeke biharê xwaş bû

bîhne axê teze

wek nanê ser sêlê û şîrê mî gahngerm dihat

dema ku

pêxwas li ser axê nerm bigerî

û bi şev bi kevirêgerm bihîlîzî

li harimê mektebê min hesen û mico dîtîn

em hevalên hevdu yê ji can û dil bûn

me qerar da ku

emê ji mektebê bi şunda danî êvarê herin kerengan

zil lêket

em ketin sinifê

mamoste xwe da kêleka textî reş

û disa dest bi tarixê kir

me guh da ser

zil lêket

em derketin derve

li harimê mektebe  
hemê ji nişke va ji min re zêf kirin magî  
ez pir qehrîm  
heta dev hatim  
mat bûm, mam

min xwast ku bi tirkî bersiva wî bidim  
lê  
ji berê da dizanim ku  
peyvên tirkî yê  
li ser zimanê min  
ê wek parcek cemed dihelin  
û wek şîvên şevnistî tamsarkî  
û bê tam in  
min girt  
peşi berda  
û  
bi hemdê xwe  
bi kurmancî bersiv da hemê  
lêbelê mêxlim bîst

te cima bi kurmancî deng kir  
ez dawestîyam  
min li mêxlim mês kir  
ji çavên hêşin çik dipêşikîn  
û wek gurekî kej  
ez temaşe dikirim  
li carekê geriyam  
li dor aliyê xwe mês kir  
mamoste yî wîqas nêzîkî min bû kû  
min girt bi navê xwedê sond xwar ku  
min bi kurmanci deng nekir.

Seyfi Dogan

## EZ DI XWE DE GIRTÎ ME

Xizan Şilan

ez  
li wêraniya temenê xwe  
bi destên dostxwiyayên ne dost  
birîndar bûm  
derya  
di êşa min de  
werimî  
qelişî  
û veçirî  
ken û şadî  
di hevîrê xeman de  
hatin stirandin  
sebir  
di qapaxa awirên çavan de  
qerimî  
bîranîn  
di kul û birînan de  
perçivî  
dil û kezeb  
li hesreta agirê evînê  
hatin sotin  
ciwanî  
li tofana çolistanan  
tarûmar bû  
êdî raman dilerize  
hevok  
li ser ziman dilikumin



ez  
di xwe de dîl im  
li kendalên neynika dil  
li xwe digirim  
ji xwe direvim  
li nav pêlên jiyana kevgirtî  
serûbin dibim  
li okyanûsa hinavên xwe  
kaptanê keştiya bêperav im  
di qelşa zinaran de  
gûlpika binevşa nebişkivî me  
li şevên mîrata tenêtiyê  
me ya jana helbestan  
dinoşim  
di destê postavanan de  
nameya bênavnîşan im  
li dibistana mirinê  
di sinifa jiyana bêbext de mam  
hestên kefenê ripîreş  
xwe li gewriyê giyanê min  
radipêçin  
termê jana helbestên xwe  
di gora efsaneke kevnar de  
vedîşerim  
di nalenala min de  
stêrkan  
şîn girtine  
her şev bareşekî xerîb  
berbangên pencera min  
miz dide  
bextreşên xwenenas  
li bihuşta dil  
reş girê dan

ava kaniya zeviyên min  
miçiqandin  
ez  
di rastiya hebûna xwe de  
xeyala  
li nav tesadûfa me  
her roj  
donzdeh mehan  
ji salnameya  
temenê xwe yê qurmiçî  
dişeqînim  
min  
sira xeyalên serserî  
li paşila rûbarên xewnan  
bi xunava maçên lêvan  
nixumand

2007-05-28

Stockholm

## Meteloka Ewra dûrandinê

Berhevkar: Rebenî Celika

Li gundekî derewînek hebîye. Vî derewînî, derewîne pir acep dikirine û hertim xwe dipesandîye, digotîye;

"Di dunê da kesî di ser min ra derewan bike tune ye.

Rokê ji royan, vî derewînî dîsa xwe di nav cimeatê da pesandîye, gotîye;

"Di dunê da kes di ser min ra derewan nake."

Lê, ji nav cimeatê yekî gotîye;

"Tu dibê çî? Li filan gundî derewînekî heye ku, di ser derewên wî da, derew tune ne."

Bi ser vê şorê da derewînê me yî ji xwe xweş, bi xwe da ketîye. Hewînî neketîye canî wî, di dilî xwe da gotîye;

"Ez çikê herim bibînim, ka hela va derewînî ku derewê di ser yê min ra dike, çî tewa ye?"

Rabîye, dayîye rêyê gundî ku derewînî din lê dimîne. Derewînê me çûye, gihîştîye wî gundî. Pirs bi pirs mala wî derewînî ku cimeatê qal dikirî dîtîye.

Çûye ber malê, li dêriyê malê xistîye. Lawikekî çar-pênc salî derî vekirîye. Derewînî me ji lêwik ra gotîye;

"Kuro! Çikê ji min ra bang li bavikî xwe bike!

Ew derewîna jî wê rokê li mal tune bîye. Lawik gotîye;

"Bavê min li mal tune ye"



Derewînî me jî pirs kiriye, gotîye;

"Çûye ku bavê te? Yê dereng were?"

Lêwik jî, gotîye;

"Li filan derê, ewrek dirîye, bavê min jî çû wê bidûrîne, yê bîstikê bi şî va were.

Bi şorê lawikî biçûk, derewînê me li mat maye. Di dilî xwe gotîye;

"Va lawikê wî derewînî yê ku ji niha da derewên veng, mestî mezin dikeye. Vî derewê veng kirin bi şî va ecaw derewên bavê yê çing in?"

Dev jê berdaye, ti çav nekirîye, kişîye, hatîye gundî xwe. Ji wê rokê bi şî va jî carika din ne qalê derewan kirîye, ne jî xwe li ser derewan pesandîye.

Çavkanî: Qûlek (Kulu)

# Meteloka Perê bûk û xwesîya wê


Berhevkar: Rebenî Celika

Bûkek hebîye. Navê xwe Per bîye. Xwesîya vê bûkê, yeka suwr û ekis bîye. Di mal da çî tiştî xweş heye di aşxanê da veşêr dikirîye. Û xwe didaye bendê, Pera bûk nêzikî aşxanê nedikirîye. Pera qeregwîn ji dest xwesîye tî-birçî digirîye. Xwesî, ew qesî dilreş bîye ku wexta here derika bi dûr jî, çend lep ard bi erdî aşxanê dirîşandîye ku, eger Per kete aşxanê, ma di pekê ligan ra xay bikin.

Rokê ji royan xwesîyê dîsa dikirîye ku here derika bi dûr, dereng vegere mal. Hîn ku neçûyî, girtîye, mîna her carikê dikirî, çend lep ard bi erdî hûndirî aşxanê rişandîye û kişîye, çûye.

Pera bûk pêncikê di dor aşxanê ra gerîye lê, mêhs kirîye ku ti çare tune ye. Ard î bi erdê hatîye rişandin.

Here tişt helîne, xwesî ya bizane. Neçar dev jê berdaye, ji xwe ra çûye ba



cîranika xwe. Perê bi cîranê xwe va bi deng dikirine ku qal li ser xwesîya, bi der ketîye. Perê jî, ji jinika cîran ra qalê halmetê xwesîya xwe kirîye, gotîye;

”Veng û veng, xwesîya min yê tişt ji ber min veşêr dikeye. Ezê nikanime helînim”

Jinika cîran jî aqilek dayîye Perê, gotîye:

”Tu jî here li kerikê sîwar be. Here di aşxanê keve. Kerê biajo ber tişt. Ti ji kerê peya mebe. Destê xwe dirêj ke, dilî te çi xwestîye, helîne. Wexta ku xwesîya te jî hatî, tu yê jê ra bibê ku ”Ker yê ketîye aşxanê, tişt xwarîye.”

Per rabîye çûye. Mîna jinika cîran gotî, li kerê sîwar biye. Ker di aşxanê

da ajotîye ber tiştan, ji sêva da bigire, ji mit da bigire, ji rûn da bigire, dilî xwe çi xwestîye, helnaye, pêşîya xwe tijî kirîye û hatîye ba jinika cîran. Vana rûniştine, li gorê dilê xwe bi wî tiştî zikê xwe têt kirine.

Di navberê ra çend wext çûne ku xwesîya Perê bi der ketîye, hatîye. Per hema bezîye pêş, gotîye;

”Xaltîyê! Ker yê ketîye aşxanê, tişt gî xwarîye”

Xwesî çûye li aşxanê, li pekê simê kerê yê li erdê xay dikirî, li halî Perê bûk mêhs kirîye, zaniye ku di vê yekê da tişteke heye û gotîye;

*Sim , simê kerê ne lê,*

*Îş, îşê Perê ne.*

Çavkanî:

Gundê Qirpingarê (Kulu/Konya)

Ew şorê ku xwesîyê gotî, di nav xelkê da belav biye û ji wê rokê pê va ew şorana mîna gotîneke pêşîyan tên gotin.

## Tirba gewr

Çi hebîye, çi tune bîye,

Mêrikek û jinikek hebûne, vana ji zû va ku zewicî bûne lê, kurikê xwe tune bûne. Mêrik bi jînikê va bi vê yekê pir diêşîne, her ro li ber Xwudê digerîyane, jê kurikek dixwestine. Çend wextan bi şun da Xwudê kirîye, keçikika vana bîye. Mêrik bi jînikê va pir şa bûne. Navê keçikê xwe Morî-mircan lénane.

Çêrok e va, sal û wext zû derbas dibin. Di ser ra çend wextê qîrar derbas bûne Morî-mircan bîye keçikika xort î bi şuret.

Rokê ji royan vê Morî-mircanê kûzê xwe helnaye, çûye ser kanîyê ku avîné bîne. Vê li ser kanîyê kûzê xwe tijî dikirîye ku ji nişka va deng bi ser kanîyê ketîye. Kanî lê hatîye zimên, gotîye;

-Wey li te Morî-mircanê! Wey li te! Hîn çi yê were serî te!

Keçik bi deng vecinîqîye, kûz ji dest xwe avêtîye, revîye çûye mal. Dayikê mêhs kirîye ku va yê bi hel-e-pel baz dideye, têye, benz-bet yî lê çûye, gotîye;

-Çir bû Morî-mircan? Çi bi te hat?

Keçikê jê ra qal kirîye. Hîngê dayik jî tirsîye, gotîye;

-Te çima pirs nekir ku çi yê were serî te? Carika din here jê pirs ke, ka çi yê were serî

te?

Morî-mircan rabîye carika din çûye ser kanîye, gotîye;

-Kanî! Çi yê were serî min?

Kanîyê, gotîye;

-Bayekî şên yê rabe, te bi ber xwe de, bibe li serî çiyakî peya ke. Li wir xanîyekî bi tenê yî heye. Di xênî da jî mezelekî gewr î spî heye. Tû yê heft sala xizmetê wî mezeli kî.

Kanîyê ver got bi şun da Morî-mircan dîsa bezîye, çûye ba dayika xwe. Yê ku kanîyê gotî ji dayika xwe ra qal kirîye. Dayikê gotîye;

-Te çima pirs nekir ku va ya kîngê bibe? Carika din here ji kanîyê pirs ke, ka va yê ku gotî, ya kîngê bibe?

Morî -mircan dîsa şandîye ser kanîyê . Morî -mircan hatîye ser kanîyê, gotîye;

-Kanî! Va yê ku te gotî, ya kîngê bibe?

Kanîye gotîye;

-A ya niha bibe!

Û bi wê va bereber ba û talazek rabîye. Morî-mircan li ber bê ketîye, firîye çûye. Bê, va helnaye, birîye li serî çiyakî peya kirîye.

Li wir Mori-mircan çendikê li dor-alîye gerîye, mêhs kirîye ku xanîyekî bi tenê yê li wir e ku mezelekî bi kevirê gewr î spî têda ye.



Morî-mircanê hingê zanîye ku va mezelê ku kaniyê ji wê ra qal kirîye. Dest pê kirîye xanî ji xwe ra rêxistîye, dora mezelê rêş kirîye, avdaye.

Êdin Morî-mircan biye xizmetkara vî mezeli spî. Her ro xizmetê wê mezeli dikirîye, dor-paş pa dikirîye, rêş dikirîye, avdidaye. Bi vê şeklê çend wextê qîrar di ser ra derbas bûne ku rokê ji royan Morî-mircan sada (sibê) bi xwe hêsiye, dîsa dest pê kirîye, dora mezelê rêş dikirîye, avdidaye ku, mêz kirîye dengî yê ji der da têne. Çûye di teqê ra mêz kirîye ku kerwanika cîngana ye. Keçik ketîye teqê ji xwe ra li vê kerwanê sêr kirîye. Çend wexta bi şî va kerwan kişîye çûye ji pêş çavan wenda biye. Morî-mircan jî rabîye ser xwe, îş-karê xwe dikirine û derîyê xênî lêketîye. Morî-mircanê derî vekirîye ku, va keçikika cîngane ye. Keçikika cîngane pirs kirîye gotîye;

-Xwangê te ti kerwan nedî ku di va de-



rana ra derbas bû?

Morî-mircanê gotîye;

-Erê, vê siwê kerwanek di vir ra derbas bû, çû.

Hîngê keçika cîngane dest bi girî kirîye, gotîye;

-Kerwan çû, ez li duy hevala mam. Niha şev jî yê reş be, eza çî xwelîya bi serî kim?

Keçika cîngane ku veng girî, dilê Morî-mircanê pê şewitiye, gotîye;

-Xwangê, were îşev li ba min bimîne,



tu yê sibê herî di kerwanê xwe bigihî.

Keçika cîngane dil kirîye, wê şevê li ba Morî-mircanê maye. Dora din yê royê, ew roka biye ku heft salê Morî-mircanê di xizmetê vî mezêlî da biqede. Sada zû da qirçinî bi ser mezêl ketîye. Keçika cîngane bi vê qirçinîyê bi xwe hêsîye, mêz kirîye û mezêl qelîşt jê xortekî bi şuret bi der ket.

Lawik ji mezêl bi der ketîye bang kirîye, gotîye;

-Kê heft salan xizmeta mezêlî min kir?

Keçika cîngane cîda gotîye;

-Min kir, xorto! Min heft salan xizmetê mezêlî te kir!

Lêwik dîsa bang kirîye gotîye;

-Kê heft salan dora mezêlî min avda?

Keçika cîngane gotîye;

-Min kir, xorto! Min heft salan dora mezêlî te avda!

Heta hingê Morî-mircan jî bi xwe hesîye, mêz kirîye ku lawik yî jî keçika cîngane ra dibê;

-Yê ku te haft salan xizmeta mezêlî min kirîbe, yê te heft salan dor mezêlî min avdabe, tu êdin jinika min î!

Morî-mircanê ku va bihîstî xwe hema avêtiye navberê gotîye;

-Xorto! Yê ku heft salan xizmeta mezêlî te kirî, dora mezêlî te avdayî, ez im! Ne va keçika ye!

Lawik li matê mayîye, ji keçika cîngane

pirs kirîye gotîye;

-Ka te got, yê heft salan xizmeta tîrbê min kirî, tu yî?

Keçîka cîngane gotîye;

-Ez im, xorto. Va keçîkîka cîngane ye, dihu li duy kerwanê mabû, min jî xêra xwe li ba xwe kire xewê. Yê derewan dikîye.

Lêwîk bi şorê keçîka cîngane hîna kirîye, Morî-mircanê çîques gotîye, lêwîk ti guh nedaye wê, gotîye;

-Rabe! Here ji vir!

Hîngê keçîka cîngane xwe avêtîye navberê, gotîye;

-Destê mede, ma bimîne, gunch e. Ma ew jî ji me ra îş-karê malê bike, xizmeta me bike.

Lêwîk dil kirîye. Êdin keçîka cîngane biye jinika lêwîk, Morî-mircan jî biye xizmetkara vana. Çend wext di ser ra derbas bûne ku rokê ji royan lêwîk gotîye;

-Ezî herime bajêr, çî dixwazine, bibên, ez ji we ra bînim?

Keçîka cîngane dest pê kirîye, êmcartîye, ji zêr-zîvan da bigire, ji kinc-kolan da bigire hezar tişt li lêwîk temeh kirîye. Morî-mircanê jî gotîye;

-Ji min ra kêrikê û bukîkê bîne.

Lawîk rabîye, çûye bajêr tiştên ku vana temeh kirî standîye û dihatiye mal ku bi rê da şik ketîye dilî wî, di dilî xwe da gotîye;

-Çima jinika min hezar tişt li min temeh kir. Lê Morî-mircanê tenê kêr û bukîkek

xwest? Heye xerê di vê yekê da tiştekek heye.

Lawîk hatîye, gihîştîye mal, tiştê vana dayîye vana. Vana hîn ku bi tiştan da ketibûne ku lawîk çûye xwe li paş sêr veşêr kirîye. Ji wir da mêz kirîye û keçîka cîngane tiştên xwe helnaye çûye hoda xwe. Morî-mircanê jî kêr kire dest xwe, bukîk jî da ber xwe, yê jî bukîkê pirs dikîye, dibê;

-Bûkê yê heft salan xizmeta mezê kir, kî wû?

Morî-mircanê ku veng pirs kir, bukîkê gotîye;

-Te kir, Morî-mircan!

Morî-mircanê dîsa pirs kirîye, gotîye;

-Kê heft salan dora mezê pak kir, avda?

Bukîkê gotîye;

-Te kir, Morî-mircan.

Bukîkê ver got bi şî va Morî-mircanê kêr rakirîye ku di xwe ra ke. Lawîk hingê ji paş sêr bi der ketîye, hatîye, bi zendê wê girtîye, gotîye;

-Min niha zanî ku ya heft salan xizmeta mezê min kirî, dora mezê min avdayî, tu yî, Morî-mircan.

Lawîk paşê çûye, bi piyê keçîka cîngane girtîye, ew avêtîye derva, qewitandîye. Morî-mircan li xwe mar kirîye, kirîye jinika xwe. Vana heta paşîyê umrê xwe di nav xêr-xweşîya da bûne.

*Çavkanî:* Teksta ku Dr. Mikailî ji gundê Mikaila ji devî Fata ji Qajo berhev kirî, gundên bi ser Qulekê (Kulu) va ye.

# Helbestek û Wêneyek

## Silavên Cegerxwîn ji Kurdên Anadolê re hene!

### Rohat Alakom

Berî salekê, di roja 3/12.2006ê de ji bo 22 saliya koçkirina Cegerxwîn ji aliyê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê civîneke bîranîn û rêzgirtinê li Stockholmê hatibû amade kirin. Berpirsên Federasyonê ji min tika kirin ku ez jî çend gotinan bêjim. Rojekê berî vê civînê dema min arşîva xwe mêze kir, ez rastî helbesteke Cegerxwîn hatim ku li wir navê Kurdên Anatoliyê jî dide û wêneyekî Cegerxwîn bi kurdekî Anatoliyê re kişandî. Çarçeva vê nivîsa min a kurt piştî van herdu keşfên min peyda bû: Helbestek, wêneyek.

Cegerxwîn di nav edebiyata kurdî de navekî mezin e. Bi helbestên xwe, bi berhemên xwe yên mayî ve gelê kurd coşand û rih da gelê kurd. Di dawiyê de bû hêzeke manevî, bavekî netewî, stûneke xwebaweriyê û bû helbestvanekî herî hezkirî. Cegerxwîn di helbesteke xwe de her wisa jî navê kurdên Anatoliyê dide û silavên xwe ji kurdên Anatoliyê re dişîne. Ev

helbesta di dîwana wî ya yekem de berî 60 salan hatiye weşandin, Şam-1945. Helbest bi vî alî û rûçikê xwe ve wek dokumenteke dîrokî jî dikare bê hesibîn. Helbest ji xwediye kovara Hawarê, Celadet Bedirxan re hatiye pêşkêşkirin û di helbestê de bangî wî dike!

Ji xwediye Hawarê re

...

*Begê min serwerê min ey Celadet,  
Şabê min rêberê min pir edalet*

*Tu binivîse di hawarê selaman,  
Ji ber min ve li kurmanca temaman.*

*Çi kurmancê Enadol û çî sûrî  
Çi goran û loran û çî sorî.*

...<sup>1</sup>

<sup>1</sup> Cegerxwîn, *Dîwana Yekan – Sewra Azadî*, Deng Yayınları, 1992, rûp. 143.



Helbest dirêj e, ez tenê vê beşa jorîn li vir diweşînim. Çawa tê zanîn, li vir jî baş tê xuyan Cegerxwîn bi vê helbestê xwe ve xwastiye gelek tiştan îfade bike. Berî her tiştî Cegerxwîn giringîya yekitiya kurdan pêşta dikşîne, çî kurdên Anadolê, çî kurdên hemû deverên mayî angorî wî divê hemû kurd bibin yek, bi kurdbûna xwe ve serbilind bibin. Babeta mayî jî giringbûna zimanê dayîkê, giringiya zimanê kurdî ye. Mesaja giringbûna zimên careke din tîne bîra wan. Ji ber van herdu sedeman

giringîya vê helbestê ji bo kurdên Anatoliyê gelek mezin e.

Bi rêya Celadet Bedirxan, bi derketina kovara Hawarê û bi rêya vê helbestê Cegerxwîn her wisa jî silavên xwe yê germîn ji kurdên Anatoliyê re pêşkêş dîke. Bi saya van rêzan her wisa jî Cegerxwîn piştgiirtiya xwe, dilgermiya xwe ji bo kurdên Anatoliyê nîşan dide. Cegerxwîn yek ji wan helbestvanan e ku cara pêşîn babeta kurdên Anatoliyê di helbestên xwe de aniye zimên.



Henefi Celepli, kesê ku li aliyê rastê yê Cegerxwîn rûniştiye



Ev helbestê jorîn û ev wêneya gazî hev dikin! Û hev temam dikin. Cegerxwîn dema hate Swêdê vê carê di pratîkê de gelek Kurdên Anatoliyê nas kirin û bi wan re bû nas. Cegerxwîn dema bi malbata xwe bi zarokên xwe ve di sala 1979an de hate Swêdê, mirov dikare bêje ku kurekî mayî jê re çê bû: Heneftî Celeplî. Kurdekî ji Anatoliya Navîn, ji gundê Celepê. Dema Cegerxwîn hate Swêdê, pêşiyê li bajarê Uppsalayê dima. Heneftî Celeplî çû Cegerxwîn anî paytextê Stockholmê. Paşê Cegerxwîn gerand û bi hevra çûne Sovyetê, çûne Almanyê, çûne nav kurdên Sovyetê ku ew jî wek kurdên Anatoliyê berî salan ji cîhê leqiyabûn, ketine rêyan, dero-dero bûbûn. Heneftî Celeplî yek ji wan kesan ku li Cegerxwîn xweyî derket û bû endamê malbata wî. Heta roja koçkirina Cegerxwîn jî bi pêra bû. Bi Cegerxwîn, bi cenazê Cegerxwîn ve tevayî çû derkete Sûriyê.

Heneftî Celeplî bi rastî jî bibû kurekî Cegerxwîn. Piştî salan Cegerxwîn bi xwe jî di bîranînên xwe de kuritiya Heneftî Celeplî qebûl dike: *“Hevalê Heneftî, bi rastî gelem li min miqat bû. Ez dikarim bibêjim weke kurekî min bi min re bî, wilo li ber destê min diçû û dihat”*.<sup>2</sup> Piştî vê hevudîdîtinê êdî rêzên helbestan dibûn rastî. Wek di rêzeke helbesta jorîn de jî dîyar dibe kurdekî Anadolê û kurdekî Sûriyê li Swêdê hastî hev hatine. Herduyan jî berê qet hev nedîtibûn. Lê belê tu dibêjî bi salan li hev geriyane û li Swêdê hev dîtine! Ev hembezkirin tê çî maneyê? Li vir jî baş tê xuyan ku bi saya hîs û bendên neteweyî (mîllî) hertim bav-kurên nû tên efrandin, çêdibin, hejmarên wan zêdetir dibin. Ev prosesa berî azadbûn û rizgariya neteweyan hin jî leztir kar dike. Cegerxwîn careke din dibêje: *Çi kurmancê Enadol û çî sûrî / Çi goran û loran û çî sorî...*

<sup>2</sup> Cegerxwîn, *Jînenîgariya Min*, Apec, 1995, rûp.358.

Çeviri:

## “BAŞARILAN BARIŞ”

### Güney Tirol: Enternasyonaleşme Yoluyla İhtilaf Çözümü

Michael Feiler

Güney Tirol ihtilafı'nın kökeni Avrupadaki diğer azınlık ihtilafları gibi birinci cihan harbi sonrasına ve o dönemde halkın durumunu gözetmeyen keyfi sınırlar çizimini öngören barış anlaşmalarına dayanıyor. Avusturya ve Macaristan ile müttefik olan İtalya kendisini birinci cihan savaşı başlarında tarafsız ilan etmiş ve ittifak güçleriyle görüşmelere başlamıştı. İtalya'nın ittifak güçlerinin yanında savaşa girmesi halinde, kendisine 26 Nisan 1915 “Londra gizli anlaşmasının” (1) 4. cü maddesi gereğince “tabi sınır olarak bilinen Brenner dahil tüm Güney Tirol’ün” verilmesi sözü verildi. Bu vaad karşısında İtalya duramadı ve 23 Mayıs 1915 de Avusturya’ya savaş ilan etti. Askeri üstünlüğüne rağmen İtalya Avusturya’ya karşı Güney Tiroli zaptetmede kayda değer askeri bir başarı elde edemedi.

1918 de Avusturya-Macarista'nın yenik düşmesi sonrasında İtalyan birlikleri Güney Tiroli çatışmasız işgal etti. St. Germain Barış Anlaşması gereğince, Avrupa'nın yeniden teritoryal olarak

dizaynına hizmet etmeyi amaçlayan Amerika Birleşik Devletleri Başkanı Wilson'un (2) 14 maddesine karşın, tüm Güney Tirol İtalyaya verildi.

10 Ekim 1920 de Güney Tirol formal olarak ilhak edildi. “Güney Tirol” olarak adlandırılan sorun, yani İtalya devleti sınırları dahilinde, nüfusu'nun % 97'nin almanca ve latince konuştuğu Güney Tiroliilerin hakları temelindeki ihtilaf ortaya çıkmış oldu.

Daha 1919 Saint Germain Anlaşmasının görüşmeleri esnasında, Güney Tirol siyasetçileri, ihtilafın içinde kırmızı bir hat gibi geçen ve münazara konusu oluşturan bir otonomi anlayışı geliştirdiler (Schober: 1982:194). Onlar şunları talep ediyordu:

- Ekonomik ve mali alanda kendi başına yetkileri olan bir temsil organı,
- otonom, yani İtalya merkezi hükümetinden mali ve personel olarak bağımsız olan bir idare,
- almanca dili'nin ayrımcılığa uğramaması ve resmi dairelerde kullanılması.

Bunlardan, Güney Tirol sorunu 'nun neden diğer azınlık ihtilafları bakımından uygun olduğu ortaya çıkıyor. Çoğunluktan oldukça bağımsız yasama ve idare, yaşamın her alanında (okul, idare, mahkeme) dillerin eşitliği gibi talepler farklı biçimlerde de olsa diğer azınlık ihtilaflarının temelini oluşturuyor.

Demokratik İtalya'nın herhangi bir ödün vermeye yanaşmaması sonrasında, faşist partinin Bozen'de 2 Ekim 1922'de iktidarı alması kötü gelişmelerin habercisi olmuştu. 15 Ekim 1923'de Güney Tirol'un italyanlaştırılmasının ateşli taraftarı olan senator Ettore Tolomei azınlığın asimilasyonunu öngören en kapsamlı programı ilan etti (3). Program, "Güney Tirol" adının, okullarda almanca derslerin, Güney Tirol kökenlilerin işten çıkarılmasını ve almanca soyadlarının, tüm yer, dağ, cadde, nehir adlarının kaldırılmasını içeriyordu. İş mezar taşlarındaki isimlerin kazınmasına kadar vardırılmak istendi. 5 yıl içinde bu programın hemen hemen tümü uygulamaya sokuldu. Belediye düzeyindeki Güney Tirol otonomisi kaldırıldı. Güney Tirol kimlikli Partiler, dernek ve kurumlar, gönüllü yangın söndürme derneğine varıncaya dek dağıtıldı. Almanca dilli basın kısmen ön sansüre tabi tutuldu veya yasaklandı. Ekonomik yaşam bir bütün olarak Roma'nın kontrolüne sokuldu. Bununla birlikte, İtalyan kökenli işgü-

